Li Îtalyayê serferberiya ji bo OCALAN

Bi nêzîkbûna salvegera komployê çalakiyên ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd jî zêde dibin. Kurdistanî û dostên wan ên li Îtalyayê, ji bo Ocalan 11'ê sibatê wek roja seferberiyê îlan kir

ÇALAKIYÊN AZADIYÊ MEZIN DIBIN

● Di ser Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re 18 sal derbas bûn û di hemû salvegerên komployê de kurdistanî û dostên kurdan bi çalakiyan azadiya Ocalan diqîrin û lanetê li komplogeran dibarînin. Îsal jî kurd û dostên kurdan li Ewropayê xwe ji bo meşa direj a 'Azadî ji bo Ocalan' amade dikin. Li aliyê din li gelek bajarên Ewropayê çalakiyên şermezarkirina komployê dest pê kiriye. Li seranserê Îtalyayê 11'ê sibatê wek roja seferberiya ji bo Ocalan hat îlankirin.

ROJEVA **Medya**

26 Çile Pêncşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 77

LI ÎTALYAYÊ KURD LI SER PÊYAN IN

● Li gelek bajarên Îtalyayê dê di navbera 27'ê çile û 11'ê sibatê de çalakî bên lidarxistin. Çalakiyên girseyî dê li bajarên Bologna, Firenze, Modena, Grosetto, Bergamo, Brescia, Padova, Torino û Milano pêk werin. Her wiha, beriya meşa mezin dê di 8'ê sibatê de li ber avahiya Şaredariya Milanoyê, tevî dostên kurdan ên îtalyayî dê daxuyaniyeke çapemeniyê bê dayîn...

→ R7

Kurd û ereb: Ocalan aştî û azadî ye

Rûpel - 7

NÛÇE

Li Çelê çalakiya gerîlayan

■ Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê, li ser çalakiyên gerîla daxuyanî da û da zanîn ku gerîlayên HPG/YJA Starê, li quntarên girê Cegerxwîn ê li Çelêya Colemêrgê, li dijî leşkeran çalakiyeke sabotajê pêk aniye. HPG'ê da zanîn ku hejmara kuştî û birîndarên leşkeran nehatiye zelalkirin...

→ R3

POLÎTÎKA

Bêrêziya li dijî wekîlên kurd

■ Daraza tirk li dijî parlamenter, hevşaredar û siyasetmedarên kurd bêrêziyê dike. Di rojekê de 4 wekîlên kurd hatin binçavkirin. Hevşaredar Gultan Kışanak û hevseroka DBP'ê Sabahat Tuncel bi awayekî kêfî tên dîlgirtin. Her wiha hevşaredar Ahmet Turk rakirin nexweşxaneyê...

→ R6

NÛÇE

Nisêbînê 'îhya' nakin dişêlînin

■ Hikumeta AKP'ê her çi qas propagandaya 'îhya' û 'inşa'yê bike jî rastî berovajî van sloganan e. Li Nisêbîna ku xwedêgiravî hilweşandina avahiyan bi dawî bûye îcar jî Wezareta Bajarvaniyê bi xaniyên çêdike dixwaze nisêbîniyan bişêlîne û malên wan dîsa bi(roşe wan...

→ R3

Jin bi dengê 'NA' dîrokê diguherînin

Tirkiye êdî ketiye pêvajoya referandûmê. Di serî de jin, sazî û dezgehên demokratîk xwe amade dikin ku di referandûmê de xweziyên desthilatperest û alîgirên dîktatoriyê di qirika wan de bihêlin. TJA, HDK, HDP, EMEP, Halkevlerî, Tevgera Hezîranê dengê na bi rêxistin dikin

JI BO 'NA'YÊ KAMPANYAYA MEZIN

Parlamenterên HDP'ê yên Amedê Feleknas Uca û Sîbel Yîgîtalp têkildarî referandûmê axivîn û diyar kir ku ew ê di 26'ê çileyê de starta kampanyaya "na"yê bidin. Parlamanteran da zanîn ku ew ê ji bo kampanyayê mal bi mal bigerin û ji gel re sedema girîngiya dengê 'na' vebêjin...

MANÎFESYOYA 'NA'YÊ AMADE DIKIN

TJA'ya Stenbolê di 29'ê çileyê de li Stenbolê starta kampanyaya 'na'yê dide. TJA'yê destnîşan kir ku jin dikarin bi dengê xwe dîktatoriyê têk bibin. Li aliyê din rêxistinên HDK, EMEP, Tevgera Hezîranê û Halkevlerî jî ji bo manîfestoya mezin a 'na'yê hêzên xwe kirin yek û dê ji bo 'na'yê dest bi xebatê bikin... RÛPEL 2/7

Têkoşîna hevpar divê

ENDAMÊ Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû Mustafa Suphî û hevrêyên wî bi bîr anîn û diyar kir ku ger hêzên sosyalîst û kurd bi hev re têkoşîna demokrasiyê bimeşînin, dê Tirkiyeya demokratîk û azadîparêz pêk were... *RÛPEL - 7*

› Îro zû be sibê jî dereng e... Reşo Wasif

→ R4

Kobanê bû sembola ronahiyê

● Di ser rizgarkirina bajarê Kobanê re du sal derbas bûn. Gelek sazî û dezgehên kurdistanî, ji bo vî bajarê ku li hemû dinyayê bi berxwedana xwe deng veda, daxuyanî dan û rizgarbûn li hemû kurdan pîroz kir. Di daxuyaniyan de hat diyarkirin ku Kobanê bûye sembola ronahiyê... *RÛPEL - 5*

Kobanê kelaya xoverdayîşî ya

Şervanê MLKPyî yo ke serrgêra 2. ya azadbîyayîşê Kobanê de ser o wina va: "Serkewtişê Kobanê seba çeteyanê DAİŞî destpêka peynîye bî."... *RÛPEL -11*

www.rewakurdi.org

Xewna wê veguherî baweriyê

BI ŞOREŞA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ re gelek jinan berê xwe da qadên xebatê û birêxistinbûna xwe ava kir. Di dema rêjîma Baasê de gelek jin ji mafê xwe yê xebat û jiyanê bê par hatibûn hiştin. Mamosteya ziman Henan Ebd El Qidûs jî yek ji wan jinên ku ji ber tenduristiyê ji qada kar bê par hatibû hiştin. Lê piştî şoreşê êdî hemû jin bê astengî tev li qadên xebatê dibin. Henan Qidûs diyar kir ku bi destpêkirina şoreşê re li gundê Hîmo şeş jinan ji bo perwerdekirina zarokan erk girtiye ser milên xwe û wiha got: "Min bi xwe gelek astengî ji ber tenduristiya xwe dikêşan. Min dibistana erebî nexwendiye, ji min re digotin tu ji ber tenduristiya xwe nikarî li dibistanê bixwînî, lê piştî şoreşê dema derfet çêbû êdî min xwe fêrî zimanê kurdî kir. Hînkirina zimanê kurdî ji bo min gelekî girîng e. Ez bi alîkariya wan jî gelekî kêfxweş bûm. Bang li jinan dikim ku cihê xwe di xebatê de bigirin, bila nebêjin em nikarin bixebitin. Ji bo serxistina şoreşê erka hemû jinan e ku xebatê bimeşînin û pêşengiyê bikin." **QAMIŞLO**

Doz nikare were girtin

Di 9'ê Çileya 2013'an de li paytexta Fransa Parîsê sê siyasetmedarên jin ên kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez hatin qetilkirin û doza der barê wan de hatibû vekirin bêyî ku bê dîtin hat xistin. Parêzer û parlamentera HDP'ê ya Edeneyê Meral Daniş Beştaş der barê doza Parîsê de ku axivî û destnîşan kir ku mirina tetikkêş Omer Guney bi guman e.

Beştaş anî ziman ku doza mezin a navneteweyî hat xistin û wiha got: "Ev doz heta gumanbar bimire dikarîbû were ronîkirin. Ev komkujiyeke polîtîk e û ji bo ev doz bê ronîkirin dê têkoşîna me bidome." Beştaş da zanîn ku di dosyayê de her tişt derneket holê û wiha axivî: "Doz nikare bi vî awayî bê girtin. Em û malbat dê şopdarên vê dozê bin. Li Parîsê girseyeke mezin a parêzeran heye ku dozê dişopînin. Lê tê pirsîn ka têkiliya Almanya û welatên din bi vê komkujiyê re çi ye. Tirkiye dixwaze vê dozê bigire. Çi hat kirin, em nizanin. Tirkiye nikare bibêje tu eleqeya min bi vê bûyerê re tune ye." **ENQERE - ŞÛJIN**

Dê mal bi mal bibêjin 'na'

Li hemberî guhertina makeqanûnê ku di meclisê de derbas bû, dê kampanya bên destpêkirin. Parlamenterên jin ên HDP'î dê îro li Amedê starta kampanyayê bidin û parlamenteran got ku ew ê mal bi mal bigerin û bibêjin 'na'

Parlamenetên HDP'ê yên Amedê Feleknas Uca û Sîbel Yîgîtalp têkildarî paketa guhertina makeqanûnê axivîn. Parlamenterên jin diyar kir ku dê îro starta kampanyaya "na"yê li Amedê bidin û wiha axivîn: "Em ê têkoşîna xwe xurt bikin. Em ê mal bi mal û kuçe bi kuçe bigerin û 'na'yê vebêjin."

Feleknas Uca destnîşan kir ku gelek derdor û jinan hebûna xwe di nav HDP'ê de dîtiye û wiha got: "Bi mebesta xebat û pirgirêkên jinan di dîroka Komara Tirkiyeyê de cara ewil e ku li meclisê Koma Meclisê ya Jinan a HDP'ê hat avakirin. Bi pergala hevserokatiyê me felsefeya jinan derxist. Ji ber vê jin xwedî li HDP'ê derketin. Ji ber vê ye ku em ji qanûneke bingehîn re ku jin tê de cih nagirin, dibêjin na." Uca diyar kir ku ew ê bi felsefeya jinên azad û ji bo jiyan û civakeke wekhev bibêjin 'na' û got ku ew ê îro deklerasyona kampanyayê aşkera bikin û ev tişt anî ziman: "Li gel van hemû zor û zehmetiyan jî me biryarek daye; em ê têkoşîna xwe xurttir bikin. Em ê mal bi mal, kuçe bi kuçe bi dayik û jinan re xebatan bimeşînin."

'BIRYARA ME NA YE'

Uca anî ziman ku di vê pêvajoyê de dibe ku provaksyon hebin lê divê ji bilî gotinên partiya HDP'ê û tevgera azadiyê gotin neyên kirin û wiha got: "Em ê nexşeya xwe ya rê diyar bikin. Bila tu kes ser me siyasetê neke, hin kes dibêjin dê HDP boykotê bike, daxuyaniyên Îmraliyê hene. Yek ji van jî ne rast e. Biryara me 'na' ye."

KHK Û OHAL

Parlamentera HDP'yê ya Amedê Sîbel Yîgîtalp jî da zanîn ku makeqanûna 1982'yan jî ya derbeyê ye û bi tu awayî pêdiviyên civakê bi cih neaniye û wiha got: "Me derbeya 82'yan jî qebûl nekir, ji ber ku pêdiviyên civakê bi cih nedianîn. Ya îro tê kirin jî li paş makeqanûna heyî cih digire. Ev makeqanûna nû dixwaze polîtîkayên Qesrê rewa bike. Bajarên me hatin rûxandin, herî zêde jinan zirar ji vê yekê dît. Em dibêjin na, ji ber ku em welatekî ku bi KHK'yan bi û OHAL'ê tê birêvebirin naxwazin." ***AMED - DÎHABER***

Îro li Amedê 'kamkanya ya ji dîktariyê re na' dest pê dike.

Meltem Cumbul dê bibêje 'na'

DI PÊVAJOYA guherandina makeqanûna de ku pêşnûmaya wê di meclisê re derbas bû û nîqaşên rejîmê tên meşandin, hunermend jî nêrînên xwe yên der barê referandûmê de li ser medyaya civakî dengê xwe aşkera dikin. Seroka Sendîkaya Lîstikvanan Meltem Culbul herî dawî di tora civakî ya Twitterê de dengê xwe aşkera kir û destnîşan kir ku ew ê di referandûmê de ji bo Tirkiyeyeke ronî, bibêje 'na'. Piştî vê, peyama Cumbul ya Twitterê di tora civakî de deng veda.

TJA'yê jin vexwandin çalakiya 29'ê çileyê

TEVGERA JINÊN AZAD (TJA) dê di 29'ê çileyê de çalakiya jinan bi banga, "Hûn dikarin gulan yek bi yek jê kin, lê hûn nikarin hatina biharê asteng bikin. Jinên ku bi hezaran rengê gulên biharê dixemilin, em benda tilîlî, govend, hêvî û raperînên wan in." tê lidarxistin.

Berdevka Herêma 2'yemîn a TJA'yê ya Stenbolê Seyrî Îpek destnîşan kir ku piştî referandûm ketiye rojevê ji bo ku bibêjin 'na' ew ê wek jin bên gel hev û got ku ew ê wiha bersiva kampanya û startan bidin. Îpek got ku armanca pêkhatina çalakiyê li hemberî pêvajoyê wekî bersivekê ye û wiha got: "Em bi têkoşîna jinan û ya gel a azadiyê bawer in. Li hemberî vê têkoşînê bê navber êrîş û girtin hene. Dixwazin bi êrîşan me bê deng bikin. Lê em dibêjin çi dibe bila bibe, em ê bigihîjin azadiya xwe. Dikarin destê me kelepçe bikin, lê dê nekarin ziman û mêjiyê me dîl bigirin. Çalakî dê di 29'ê çileyê de li Avahiya HDP'ê ya Bagcilara Stenbolê pêk were. **STENBOL - ŞÛJIN**

'Em teslîm nabin'

Jinên Cizîrê yên malên xwe terk nekirin, zarokên xwe terk nekirin û tev li berxwedana rêveberiya xweser bûn, bi alên spî meşiyan. Yek ji van jinan jî dayika hevserokê Meclisa Gel Mehmet Tunç û Orhan Tunç ê birîndar, Esmer Tunç bû. Dayika Tunç ew roj vegotin û da zanîn ku divê Cizîr neyê jibîrkirin û berpirs bên cezakirin. Tunç anî ziman ku Mehmet qehremanekî cîhanê bû û neheqî qebûl nedikir.

Tunç da zanîn ku Mehmet di seranserê jiyana xwe de li dijî zilmê bê deng nemaye û wiha got: "Ez bi kurê xwe her tim serbilind bûm. Zirar nedida kesî. Zarokên min kurd bûn û ji ber ku li ser axa xwe bi rûmet dijiyan, hatin qetilkirin. Lê dewlet tecawizkaran diparêze. Li vir mirov bi zindî şewitandin. Mehmet ji bo ku birîndaran xilas bike çû wir û qetil kirin." Tunç anî ziman ku ne tenê di jêrzemînan de di xaniyên cuda de jî mirov hatin qetilkirin û çapemeniyê hewl da serê hemûyan bigire û dayikên ducanî bi pitikên xwe re wek dijmin hatin dîtin.

Tunç destnîşan kir ku kurê wê Orhan jî ji bo birîndaran çûye jêrzemînê û wiha pê de çû: "Mehmet di 27'ê sibatê de derket televîzyonê û got dibe ev axaftina min a dawîn be. Êvarê saet 8 bû, agahî hat. Orhan, Mehmet û kesên li wir hatibûn qetilkirin. Dewletê her cenazeyek şand cihekî. Ji bo zêdetir êşê bidin malbatan. Lê me tu carî serî netewand. Em bi alên spî daketin kolanan û teslîm nebûn. Mehmet digot 'heta dilopek xwîna me hebe jî em ê li ber xwe bidin.' Wê demê ez û 9 dayikên din bi alên spî ji bo cenazeyên zarokên xwe çûn jêrzemînan." Tunç got ku wê demê mala Mehmet jî şewitandine û ev bi zanebûn kirine û dîsa jî axa xwe terk nekiriye û dê nekarin kurdan biqedînin. ***ŞIRNEX - ŞÛJIN***

Jin dê serî netewînin

Bi biryarên KHK'an, qeyûman dest danî ser şaredariyên DBP'î û sazî û dezgehên xebatên jinan ên van şaredariyan asteng kirin. Têkildarî van êrîş û destwerdanên qeyûman, li avahiya DBP'ê ya bajarê Wanê civîneke çapemeniyê hat lidarxistin.

Hevseroka DBP'ê ya Wanê Sevînç Şeker, hevşaredarên DBP'yî yên qeyûm li şûna wan hatin tayînkirin, aktîvîstên TJA'yê û endamên Meclisa Dayikên Aştiyê tev li civînê bûn. Hevşaredara Artemêtê ya DBP'yî Rojbîn Sevîl Çetîn di civînê de axivî û diyar kir ku destkeftiyên wan ên bi têkoşîna demokratîk û kedeke mezin a bi salan bi dest xistine, ji aliyê hikumeta navendî ve bi biryarnameyan, bi rêbazeke derbeyê hatine desteserkirin. Çetîn da zanîn ku desteser bikin jî lê ew ê bi nêrîna jinên azad karê xwe berdewam bikin û wiha got: "Jinên ku keda wan ji aliyê zîhniyeta nêrza ve beriya hezaran salan hatiye talankirin, tu carî têk neçûne. Wê ji niha û pê ve jî têk neçin û li ber xwe bidin." ***WAN - ANF***

Keda dê û dotê

Jinên Êlihê li gel hemû astengiyan bi keda destê xwe pirsgirêka xwe ya aboriyê çareser dikin. Yek ji wan jinên ku bi keda xwe li ser pêyên xwe disekine jî Enîse û keça xwe Hebîbe Uslu ne. Keç û dayik beriya çend salan li taxa Ondokuz Mayîsê ji xwe re kargeh vekir û bûn xwediyên karên xwe. Uslu (60) serê sibê zû radibe û ji bo çêkirina nanê sêlê deriyê kargeha xwe vedike. Uslu ku dayika 6 zarokan e û heya niha her tim ji bo debara wan xebat kiriye diyar kir ku divê hemû jin di serî de haya wan ji hêza wan hebe û wiha dibêje: "Lê ji ber ku jin naxebitin, derfetên wan çênabin." Keça Enîseyê Hebîbe Uslu jî destnîşan kir ku di cîhanê de tişta herî xweş ew e ku jin pereyên xwe bi xwe bi dest bixin û wiha axivî: "Ez berê jî di gelek karan de xebitîme, lê ya herî xweş ev kar e. Ji ber ku li ser serê me patron tune ye. Em kardêrên xwe ne û kengê dilê me xwest em wê demê tên. Kesekî ku em hesabê bidinê tune ye." **ÊLIH - ŞÛJIN**

Endamê meclisê 6 roj e winda ye

Endamê Meclisa Şaredariya Sarayê yê DBP'ê Burhan Ozevlî, dema ji bo karekî çû Gurgumê û vedigeriya peywendiya pê re qut bû. Ozevlî ku di 13'ê çileyê de bi wesayîta xwe ya tayebt ji karekê xwe çû Gurgumê, di 19'ê çileyê de bi malbata xwe re hevdîtin pêk anî û diyar kir ku ew ji bo bê Wanê derketiye rê. Malbata Ozevlî ku ji wê demê heta niha venegeriyaye malê û telefona wî girtiye, serî li Midûryeta Polîsan a Bajar da. Malbat piştre çû Gurgumê. WAN

Ji îstîsmarkar re 45 sal ceza!

Li Îzmîrê, mamosteyê bi navê Şevket G. (61) ê 3 xwendekarên xwe yên berastengên zihnî îstîsmar kir, der barê wî de îdianame hat amadekirin û ji 22 sal û nîvan heta 45 salan cezayê girtîgehê hat xwestin. Di îdianameyê de îfadeya T.Ç. ya rastî îstîsmarê hat cih girt û T.Ç. diyar kir ku ji bo ew ji kesî re nebêjin tim gef li wan dihat xwarin û wiha got: "Tim ji me re digot, 'eger hûn ji kesî re tiştekî bibêjin ez ê we daxim jêrzemînê û mişkan bi we bidim xwarin.'" Dê yekemîn rûniştina dozê di 3'yê adarê de pêk bê. ÎZMÎR

Ewlehiya F.'yê di xetereyê de ye

Li Pasûra Amedê zaroka bi navê F. salekî rastî îstîsmara 86 kesan hat û ji van tenê 10 kes girtî tên darizandin û zarok û malbata xwe rastî tehdîda wan kesan tên. Parêzera dozê Elîf Tîrenç da zanîn ku zexta rayagiştî û xwedîderketina li dozê wê geşedanên girîng derxîne holê. Elîfê diyar kir ku dermankirina F didome û wiha got: "Niha ewlehiya F di xetereyê de ye û navnîşana wê veşartî tê girtin û kes pê re hevdîtinê nikare bike." AMED



Ne zilamê tacîzkar jin hatin cezakirin

Jinên DTCF'ê sala borî di meha adarê de li Zanîngeha Enqereyê tacîzkar Ersel Çetîn teşîr kirin û parastina cewherî pêk anîbû. Tevî di ser bûyerê de 9 meh derbas bû Dekant der barê mêrê tacîz kir de tu tiştek nekir û ji bo 6 jinan mehekê ji dibistanê biryara durxistinê da. Xwendekara Arkeolojiyê Eylsem Esenê wiha got: "Der barê tacîza Ersel Çetîn de pê re axivî lê wî heqaretê le me kir. Em jin jî li baxçe ku Çetîn dît li hemberî wî parastina cewherî pêk anî." ENQERE

Gerîla li Çelê çalakiya sabotajê pêk anî

Gerîlayên HPG/YJA Starê, li quntarê girê Cegerxwîn ê li navçeya Çelê ya Colemêrgê, li dijî leşkerên tev digeriyan çalakiyeke sabotajê pêk anî.

HPG'ê li ser çalakiyên gerîla û êrîşên hewayî yên artêşa tirk ev agahî da: "Roja 23'ê çileyê saet di 09:00'an de, hêzên me li quntarê girê Cîgerxwîn ê li navçeya Çelê ya Colemêrgê, li dijî leşkerên tev digeriyan çalakiyeke sabotajê hat lidarxistin. Hejmara leşkerên mirî û birîndar nehat zelalkirin. Roja 24'ê çileyê saet di navbera 20:00–20:30 de balafirên şer ên artêşa TC, mintiqeya Deşta Kafya, Begarê û derdora gundê Zevka yên herêma Garê, di heman wextê de gundê Rençbiraxam ê li herêma Zapê bombe kirin. Heman rojê saet di navbera 18:00–20:00'an de balafirên şer bombe li quntara Tepê Sor ê li herêma Avaşînê û saet di navbera 18:30–22:00'an de mintiqeya Ermuşa Jêr a li herêma Xakurkê barandin. Di bombebaranê de tiştek bi kesî nehat, lê belê ziyan li dehl û rezên gundiyan çêbû." BEHDÎNAN - ANF

Parlamentera HDP'ê Leyla Bîrlîk bi wesîleya salvegera berxwedana xwerêveberiyê diyar kir ku heke berxwedan nebûya dê zêdetir mirov bihatana qetilkirin

Berxwedanê pêşiya qetlîamên mezintir girt

Piştî ku pêvajoya 'çareseriyê' ji aliyê desthilatdariya AKP'ê ve ji holê hat rakirin, li bajarên Kurdistanê şerekî giran dest pê kir. Silopî û Cizîr ji wan navçeyan e ku şerekî giran lê qewimî. Qedexeya derketina derva ku di 14'ê kanûna 2015'an de dest pê kir û di 2'ê tebaxa 2016'an de bi dawî bû, 79 rojan dewam kir. Di nava vê demê de şêniyên bajêr neçarî koçberiyê hat hiştin û tevî pitika 3 mehî Mîray, gelek zarok hatin kuştin. Bi dehan xanî û kargeh hatin hilweşandin. Di dema şer de li kolanên Bostanci, Narîn û Akdenîzê zêdeyî 300 kes hatin kuştin.

Yek ji şahidên vê yekê parlamentera HDP'ê ya Şirnexê Leyla Bîrlîk e. Bîrlîk, berxwedana xwerêveberiyê ya li gelemperiya Şirnexê vegot.

Bîrlîk da xuyakirin ku piştî hilbijartina 7'ê hezîranê ku beriya wê pêvajoya 'danûstandinan' û Mutabaqata Dolmabaheçyê ji aliyê AKP'ê ve hat redkirin, zext, zordarî, binçavkirin û girtin li gelemperiya Kurdistanê bi taybetî li

Şirnexê zêde bûn. Bîrlîk destnîşan kir ku gelê kurd jî li dijî van êrîşên AKP'ê biryara berxwedanê da.

Bîrlîk bal kişand ser çalakiyên di wê demê de ji bo şikandina dorpêçiya li Cizîr û Silopiyê hatin lidarxistin û wiha got: "Eger berxwedan nebûya, dê hîn bêhtir mirov bihatina kuştin, dê hîn bêhtir avahî bihatina xerakirin. Mirovan ji bo xwe bigihînin Cizîr û Silopiyê bi rojan li navenda Şirnexê çalakî li dar xistin. Weke ku hûn jî dizanin, gelê Şirnexê ji bo piştgiriyê bide Cizîr û Silopiyê berxwedêr, tevî ku rê girtî bûn jî ji astengiyan derbas bûn û di ser Çiyayê Cûdî re berê xwe dan Cizîrê. Bi şev bi hezaran kesî xwe gihandin Çiyayê Cûdî. Lê belê bi obusan êrîşî wan kirin. Gelê Şirnexê dabû xuyakirin ku ew ê Şirnexê neterikînin. Li dijî êrîşên bi rojan dewam kirin, jin, ciwan, zarok, extiyar, her kesî li her cihî li ber xwe dan. Destaneke berxwedanê ya ku di dîrokê de mînaka wê nehatiye dîtin, li kolanên Cizîrê hat nivîsandin. Mehmet Tunç û hevalên wî gotin, ew ê bêrûmetiyê, teslîmiyetê qebûl nekin û serî li ber vê zilm û înkarê netewînin. Ev sekna wan, dîrokî bû."

Bîrlîk di dawiya axaftina xwe de balê kişand ser zextên li gelê Şirnexê tê kirin û xwest, rêbazên 'ewlekariyê' derhal bên terikandin. *ŞIRNEX - ANF*

Careke din mexdûr dibin

Li Nisêbîna ku li taxên wê bi piranî rûxandina avahiyan temam bûye, tê diyarkirin ku dê li şûna mal û heqê avahiyên welatiyan ên hatine rûxandin, di çarçoveya projeya tê plankirin de ji aliyê Wezareta Hawirdor û Bajarsaziyê ew daîre bên dayîn. Dema daîre bên dayîn jî dê ji bo her daîreyeke ku buhayê wê yê raîşê 80 hezar TL ye, dê wezaret daîreyên bên çêkirin di navbera 100-140 hezar TL'yî de bedêlekê bixwaze. Yanî dê welatî bibin deyndarê dewletê.

Welatî têkildarî pêşnûmeyê diyar dikin ku ya girîng ew e ku dê piştî vê merhaleyê dest pê bike û wiha dibêjin: Heke gel projeyê nexwaze, dê projeya pêk neyê."

Her wiha wezaretê di vê demê de şîrketên sîgortayê jî di dewrê derxist. Piştî xebata tespîtê, hat diyarkirin ku divê bedêla avahiyên welatiyan di demeke kin de bê dayîn, lê wezaretê vê rewşê asteng kir. *MÊRDÎN - DÎHABER*

'Heta ku bimirim ez ê aqûbeta birayê xwe bipirsim'

Li herêmên Kurdistanê di salên 1990'an de ji ber şer bi hezaran mirov bi zorê hatin windakirin an jî bûn qurbanê "kuştinên kiryarnediyar". Mehmet Şîrîn Maltu jî wekî kurteya bûyerên bi zorê windakirinê yên di salên 90'an. Mehmet Şîrîn Maltu li gundê Zediye ya navçeya Hezo ya Êlihê jiyan dikir. Di 10'ê sibata 1995'an de leşker, cerdevan û tîmên taybet a bi ser mala Maltu de girtin li ber çavên malbat û gundiyan îşkence li wî kirin û wî xistin binçavan. Dema ku di bin çavan de bû malbatê serî li dozgeriyê da lê dozgeriyê bersiva "Maltu nehatiye binavçikirin" da wan. Ji wê rojê heta niha ji aqûbeta Maltu agahî nehatiye wergirtin.

Altun Maltu Bîçîcî ya ku her hefte rojên şemiyê li ber Abîdeya Mafên Mirovan aqûbeta birayê xwe dipirsî li hemberî qedexeya walîtiyê ya bi hinceta OHAL'ê nerazîbûn nîşan da gotina "Heta bimirim ez ê aqûbeta birayê xwe bipirsim û li qadan bim."

ÊLIH - DÎHABER

Li girtîgehan çi dibe?

Bi Rewşa Awarte re yek ji saziyên ku hatin girtin jî Komeleya Hevgirtin û Alîkariya bi Malbatên Girtiyan re (TAY-DER) bû. Piştî ku sazî hate girtin hevserokê saziyê yê Îzmîrê Mûsa Karbadag jî hate girtin û di 17'ê çileyê de serbest hat berdan. Karbadag di salên 90'î de tê girtin û 10 salan ceza dixwe. Ji wê demê ve jiyana xwe daye têkoşîna li dijî binpêkirinên mafan ên li girtîgehan. Karbadad ji 2012'an ve Hevseroktiya Şûbeya Îzmîrê ya TAY-DER'ê dikir. Karbadag da zanîn ku li girtîgehan ew hatine rewşa ku êdî gotin qediya ye.

Karbadag bi Rewşa Awarte re behsa binpêkirina mafê mirovan a li Girtîgehan Şakranê kir û ev tişt got: "Li Girtîgeha Şakranê bi navê 'Îsyana FETO' li ser girtiyên kurd û şoreşger plana komkujiyê heye." ÎZMÎR - ANF



Amed bi berfê spî bû!

Li Amedê ji ber barîna berfê her dera bajêr spî bû. Bajarê ku li gorî salên borî hewa germ bû ji nişka ve berfê dest pê kir.

Li cadeyên bajar fişorkarên seyar jî ji bo ku xwe germ bikin agir pêxistin û bi vî rengî hewl didin ku xwe germ bikin. Firoşkarên seyar ên ku teneyên ku anîne tijî dar kirin û pêxistin li dora agir li benda kiryarên xwe in. Welatiyên ku ji rê derbas dibin jî li ber agirê firoşkarên seyar pêxistine xwe germ dikin. *AMED - DÎHABER*

www.arsivakurd.org

Li Almanyayê du DAIŞ'î hatin girtin

DI ENCAMA DOZA lêpirsîna Dozgeriya Federal de, li bajarê Bonn ê Almanyayê 2 kesên ku hatin binçavkirin, hat diyarkirin ku welatiyên Fasê ne û birayên hev in. Temenên wan çeteyan di navbera 24 û 25 saliyê de ne, di sala 2013'an de di ser Tirkiyeyê re derbasî Sûriyeyê bûne. Her wiha li vir tev li nava komên çeteyan bûne û perwerdeya leşkerî dîtiye. Tê îdiakirin ku wan çeteyan perwerdeya leşkerî ya DAIŞ'ê dîtiye û di gelek qetlîaman de jî cih girtiye. BONN - ANF

MPKE: Bila rojnamegerên girtî bên berdan

Meclisa Parlamenteran a Konseya Ewropayê (MPKE) bal kişand ser girtina rojnamegeran a li Tirkiyeyê û xwest ku mirovên ji ber karê rojnamegeriyê hatine girtin bi lezgînî werin berdan

Li Meclisa Parlamenteran a Konseya Ewropayê pêşnûmayeke pêşkêşî dengdanê hat kirin û di vê pêşnûmayê de hat ragihandin ku rewşa rojnamegeran li welatên Konseya Ewropayê (KE) bi taybetî Tirkiyeyê, di asta 'alarmê' de ye. Di metna pêşnûmayê de hat xwestin ku hemû rojnamegerên bi îdiaya 'bi rengekî çalak tev li sûcdariyên terorê bûne' tên sûcdarkirin, bên berdan.

Dengdan bi wesîleya rapora KE'yê ya li ser êrîşên li dijî azadiya rojnamegeran li Ewropayê, hat kirin. Ji bo pêşnûmayê li MPKE 110 dengên 'erê', 15 dengên 'na' û 9 dengên 'bêalî' derketin.

Di rapora navborî de hat ragihandin ku ji çileya 2015'an û vir ve 16 rojnameger li welatên Ewropayê hatin kuştin û bal kişandin ser kuştina rojnamegeran a li Ûkrayna, Rûsyaya Spî û Tirkiyeyê. Di raporê de hat bibîrxistin ku di kanûna 2015'an de rojnamegerê ji Sûriyeyê Najî el Jerf li Dîlokê hat kuştin û rexne hat kirin ku tevî ku tê zanîn çeteyên DAIŞ'ê berê gef lê dixwarin, hê jî kujerên wî nehatine peydakirin.

REWŞA TIRKIYEYÊ

Di raporê de hat gotin ku zêdeyî 100 rojnameger li Tirkiyeyê girtî ne, kartên çapemeniyê ya bi sedan rojnamegeran jî hatine betalkirin. Her wiha rexne hat kirin, ji ber ku ji 15'ê Tîrmehê û vir ve li Tirkiyeyê zêdetirî 100 rojname, kovar, radyo û televîzyon hatine girtin. *STRASBOURG - ANF*

Îro zû be sibê dereng e

Civîna Astanayê ya ku ew qas li ser propaganda hat kirin, bi dawî bû. Troykaya ku civîn bi rê ve dibir jî ji encamê ne razî ye. Gotin di cih de be encam fiyasko ye. Gelek sedemên ku ev encam diyar kir hene. Lê sedema mezin ew e ku rêveberiya rojavayê Kurdistanê ji ber ku nehat vexwendin ev encam derket pêş. Ji ber ku ji 4'an 1'ê Sûriyeyê di bin kontrola kurdan de ye û herêma herî biistîkrar e.

Sedema din a girîng jî ew e ku çeteyên hem bi rejîmê re, hem bi kurdan re û hem jî bi hev re şer dikin hatibûn vexwendin û wekî aktorên di pêşeroja Sûriyeyê de ji bo wan hate xwestin ku kirasek bê dirûtin.

Tabî yek ji sedemên herî girîng jî ew bû ku Tirkiyeya di alozî, şer û xwîna li Sûriyeyê tê rijandin de xwedî par e, di nav troykaya Astanayê de bi Rûsya û Îranê re rûnişt. Piştî civînê hem aliyê Îranê û hem jî aliyê Sûriyeyê bi zimanekî 'dîplomatîk' diyar kir ku sedema bêencamiya civînê hebûna Tirkiyeyê bi xwe ye.

Girêk
Reşo Wasif

Helbet der barê Astanayê û vê encamê de gelek nirxandin û şîrove hatin kirin. Heta di nirxandinan de aliyên xwedî wijdan got ku heke kurd nebin dê encamek jê dernekeve. Wisa jî bû. Êdî li Rojhilata Navîn bêyî kurdan plan û proje ne mimkûn e ku biçin serî û encamên erênî ji wan dernakevin. Kurdan bi têkoşîna xwe rûşta xwe îspat kir. Li gel halê xwe yê parçeyî jî ev yek pesend kir ku êdî ne fîguran, lê aktoreke sereke ye.

Niha di Astanayê de jî bi nîvzarê derew ev yek hat gotin. Hat gotin ku diviya kurd jî di civînê de amade bûna. Hat gotin ku di civîna nîhayî ya li Cenevreyê de divê kurd jî hebin. Lê ez ji niha de bibêjim heke kurd heta wê demê di nav xwe de yekitiya siyasî pêk neynin dê li Cenevreyê jî ji mafê temsîliyetê bê par bimînin.

Di Astanayê de nûnerên esasî na lê bi zora Tirkiyeyê ENKS'a ku parçeyeke ji SÛK'ê ye hat vexwendin. Lê ENKS'ê bi qasî hevserokê berê yê Meclisa Sûriyeya Demokratîk Heysem Menna yê ereb bi rûmet tev negeriya. Menna di civîna Cenevreyê de hatibû vexwendin lê camêr got heke kurd nebin ez tev lê nabim. Helwesta Menna û helwesta Îbrahîm Biro û Ebdulhekîm Beşar ên ENKS'î mirov dide berhev, zimanê mirov nagere ku mirov ji Biro û Beşar re bibêje kurd.

Ev pêvajo jî pir dişibe pêvajoya 1'emîn Şerê Cîhanê ku di serî 1900'an de plana wî hat kirin û di 1914'an de dest pê kir. Tam 100 sal piştî wî şerê hanê 3'yemîn Şerê Cîhanê pêk tê. Di vî şerê de heke kurd dixwazin bi êş û azarên hindiktir bigihîjin azadiya xwe; yekitiya siyasî ji nan û avê jî elzemtir e. Yan na xetereya li pêşiya kurdan gelekî mezin e. Kurt û kurmancî heke yekitî nebe dê kantonên Rojava ji holê bên rakirin. Piştre dê Başûr ê ku li ketina Rojava temaşe bike were pelçiqandin. Îran dê vê yekê ji bo xwe wek fersend bibîne û dê bixwaze derba mirinê li Rojhilat bixe; şerê dawîn û yê herî bixwîn jî dê li Bakur pêk were û dê gelek direj biajo. Hişk û ter dê tev de bişewitin. Ji bo yekitiyê heke îro zû be sibê jî dereng e.

Li Almanyayê koalîsyona CDU-SPD'ê

Li gorî lêkolîna ji aliyê Spiegel Online ve hate kirin, rêjeya dengê Partiya Yekitiya Demokrat a Xiristiyan (CDU) a bi serokatiya serokwezîr Angela Merkel ji sedî 37.1 e. Hevrikê herî nêz ê CDU jî hevparê koalîsyona heyî Partiya Sosyal Demokrat (SPD) e, ku rêjeya dengê vê partiyê ji sedî 20.4 e.

Li gorî anketê, partiya Alternatîf ji bo Almanyayê (AFD), ku bi gotinên xwe yên li dijî koçberî û Yekitiya Ewropayê derdikeve pêş, ji sedî 13.,2, Partiya Çepgir (Die Linke) ji sedî 9.5'ê dengan digirin.

Rêjeya dengê Partiya Keskan jî ji sedî 9.3, ya Partiya Demokrat a Lîberal (FDP) ji sedî 6.2 ye. Li gorî vê encamê, partiyên CDU û SPD li gorî sala 2013'an kêmê daye. Hemû partiyên din jî dengên xwe zêde kirine.

Lê belê li gorî anketê koalîsyonên kevneşop ên li eniya rastgiran CDU-FDP, yan jî li eniya çep SPD-Kesk an jî Die Linke pêkan xuya nake. Ji ber ku tu partî naxwazin bi AFD'ê re koalîsyonê bikin, xuya ye wê CDU-SPD careke din koalîsyonê çêkin. Ger koalîsyona CDU-SPD li derve bimîne, wekî îhtîmala herî xurt, 'Koalîsyona Jamaîka' ya ji CDU-Kesk-FDP derdikeve pêş. BERLÎN - ANF

ECB'ê Trump hişyar kir

Serokdewletê DYA'yê Donald Trump, di çarçoveya polîtîkaya xwe ya aboriya xweparêz, peymanên bazirganiya serbest yek bi yek betal dike. Li dijî van biryarên Trump, Herêma Ewroyê hişyarî da.

Ekonomîstê sereke yê Bankaya Navendî ya Ewropayê (ECB) Peter Praet hişyarî da ku betalkirina peymanên hevkariyê ji aliyê Trump ve bi yekalî, dê rê li ber reaksiyona dewletên din veke. Praet diyar kir ku dewletên di nava peymanê de cih digirin, dibe ku 'bi qisasî' tev bigerin.

Donald Trump biryarnameya ku Peymana Hevkariya Trans-Pasîfîk bi yekalî betal dike, îmze kiribû. Trump îdia dike ku peymanên bi vî rengî hejmara bêkaran a li welatê wî zêde dike û dixwaze Peymana Bazirganiya Serbest a Bakurê Amerîkayê (NAFTA) ku di navbera DYA, Meksîka û Kanadayê de di meriyetê de ye, ji nû ve binirxîne.

Tevî DYA'yê, Japonya, Kanada, Sîngapûr, Zelandaya Nû, Şîlî, Brûneî, Awustralya, Perû, Vîetnam, Malezya û Meksîka di nava peymana TPP de hene. Piştî ku DYA'yê xwe ji peymanê vekişand, tê gotin ku dê hin welat li şûna DYA'yê berê xwe bidin Çînê ku hevrika DYA'yê ye. *FRANKFURT - ANF*

Trump Amerîka ji Rojhilata Navîn re girt

SEROKÊ Amerîkayê Donald Trump daxuyand ku ew plansaziya di warê ewlehiya neteweyî de "bibe rojeke mezin" dikin. Ajansa Nûçeyan a Reutersê daxuyand ku serokê Amerîkayê Donald Trump ji îro pê ve biryarnameyên ku ketina pênaberan li Amerîkayê sînordar dikin, îmze bike. Li gorî nûçeyê di nava van biryarnameyan de bi awayekî demî rawestandina qebûlkirina penaberan û rawestandina welatiyên ku ji Rojhilata Navîn û Amerîkayê Başûr tên jî heye. Di nava welatên ku têketina wan a Amerîkayê qedexe de; Sûriye, Iraq, Îran, Lîbya, Somalî, Sûdan û Yemen hene. **WASHINGTON - DÎHABER**

Ji girtîgeheke Brezîlyayê 62 mehkûm reviyan

Li girtîgeha Baûrûyê ku bi qasî 330 kîlometre dûrî paytexta eyaletê Sao Paulo ye, îsyan derketibû. Li vê girtîgehê ku mehkûm ji bo kar an jî perwerdeyê dikarin derkevin, piştî ku gardiyanan dest danîn ser telefona mehkûmekî, îsyan derket û li hin beşên girtîgehê şewat derket.

Hat ragihandin ku 152 mehkûmên ku ev şewat ji bo xwe wek firsendê dît, reviyan lê 90 kes ji wan ji aliyê hêzên ewlekariyê ve hatin girtin. Li gorî daxuyaniya rêveberiya girtîgehê, mafê derketina bi destûrê ya mehkûmên reviyane, hatiye betalkirin. Di daxuyaniyê de hat gotin ku li girtîgeha ku kapasîteya wê hezar û 124 kes e, hezar û 430 hikumxwar û girtî dimînin. Li Brezîlyayê, ji 1'ê çileyê û vir ve li girtîgehan ji ber şerê di navbera çeteyên sûc de û îsyanê, bi qasî 140 mehkûm hatin kuştin. *SAO PAULO - ANF*

El Şebabê êrîşî otelekê kir

Rêxistina terorîst a El Şebabê li paytextê Somaliyê êrîşî otelekê kir û li gorî zanyariyên destpêkê di êrîşê de herî kêm 12 kes hatin kuştin. Li gorî nûçeya ajansa AFP'ê di nava kesên birîndar de rojnameger jî hene.

Êrîş li dijî Otela Daya ku li Mogadîşûyê li ser cadeya Mekke-i Mukerremê ye, pêk hatiye. MOGADÎŞO

www.alikurdi.org

Bi şahiyekê keça xwe tev li YPJ'ê kir

Keça ciwan a bi navê Fehîme Hesen (21) bi hêza jinê di hemû qadên jiyanê de bawer kir û bi piştgiriya malbata xwe tevli nava refên YPJ'ê bû. Malbatê bi vê boneyê şahiyek li gundê Birc Heyder a navçeya Şêrawa ya Efrînê li dar xist. Di şahiyê de şêniyên gund û şervanên YPJ'ê amade bûn. Fehîme bang li hemû malbatan kir ku li pêşiya xwesteka zarokên xwe nebin asteng. Herî dawî jî Fehîme Hesen piştî ku xatir ji malbata xwe xwestî, tevli refên YPJ'ê bû. **EFRÎN**

Hejmara koçberan her ku diçe zêdetir dibe

Pêla koçberiya ber bi rojavayê Kurdistanê ve her ku diçe zêde dibe. Bi taybetî bi destpêkirina qonaxa duyemîn a rizgarkirina Mûsilê hejmara penaberan zêde bû. Di vê çarçoveyê de ji 16'ê çileyê heta 25'ê çileyê 297 (1017 kes) derbasî kampa Holê ya Hesekê bûn. Her wiha 60 welatiyên din jî ji Dêra Zorê koçberî kampê bûn. Berpirsên kampê jî dan zanîn ku hejmara koçberan her ku diçe zêde dibe û banga alîkariyê ji rêxistinên navneteweyî kirin. **HESEKÊ**

Li Minbicê sîstema trafîkê tê birêxistinkirin

Midûriyeta Veguhestinê di 4'ê kanûna 2016'an de ji aliyê Meclisa Sivîl a Minbicê ve hate vekirin. Midûriyetê heta niha di beşên rêveberî, ruxset, hunerî, dîwan, malî, kontrolkirin û rêxistinkirin û arşîvê de xebatên xwe di meşîne. Di rojên diyar kirî de jî wesayîtan bi alîkariya Gumrik û Trafîkê qeyd dike. Di her rojekê de li gorî cureyên wesayîtan rûxset tê çêkirin. Rêveberên midûrtiyetê dan zanîn ku wan heta niha 3 hezar û 600 wesayît qeyd kirine. **MINBIC**

Komîteyê madeyên demborî şewitandin

Komîteya Pêjiyanî ya gundê El Erîşe, di çarçoveya xebatên lêgerînê û kontrolkirina dikanan gundên girêdayî herêma Şedadê de, di hin dîkanan de rastî madeyên demborî hat. Komîteyê madeyên demborî desteser kirin û li cihekî ku dûrî avahiyan dikeve şewitandin. Endamên komîteyê ji bo xwediyên dikanan jî cezayê pereyan birî. Endamên komîteyê dan zanîn ku di xebatên wan bidomin û bang li welatiyan kirin ku di vê mijarê de ji wan re bibin alîkar. **HESEKÊ**

Kobanê bû rûmeta mirovahiyê

Dayik, bav û hevjînên lehengên Kobanê dibêjin ku zarokên wan ji bo tevahiya mirovahiyê canê xwe feda kiriye. Malbatên şehîdan roja rizgarkirina Kobanê li tevahiya mirovahiyê pîroz kir

NÛRŞAN ÎBRAHÎM / MIZGÎN ELÎ / KOBANÊ - ANHA

Malbatên şehîdên şoreşê bi boneya 2'yemîn salvegera rizgarkirina Kobanê diyar kir ku roja rizgakirina Kobanê, rojeke dîrokî û pîroz e. Malbatan 25'ê çileyê li tevahiya malbatên şehîdan pîroz kir.

Bi boneya duyemîn salvegera rizgarkirina Kobanê ji çeteyên DAIŞ'ê, malbatên şehîdan ku keç û xortên xwe di berxwedanê de feda kirine axivîn. Der barê mijarê de hevjîna şehîd Ebdo Koro ya bi navê Hesna Hisên ku bi eslê xwe ji Filistînê ye, salvegera rizgarkirina Kobanê li tevahiya şehîdan pîroz kir û hestên xwe wiha anîn ziman: "Ev roj ji bo me rojeke dîrokî û pîroz e. Ev jî bi saya fedakariya şehîdan pêk hat. Ev aramî û aştî ne ji ber xwe ve hatiye. Ev hemû bi berxwedan û xwînê hatiye. Ez û zarokên xwe bi şehadeta hevjînê xwe serbilind in. Ew ê her dem di bîra me de be."

ŞOPDARÊN ŞEHÎDAN

Kalê Fethî Helî ku bavê şehîd Êrîş Kobanê ye jî şehîdên berxwedana Kobanê bi rêzdarî bi bîr anîn û salveger li hemû kobanêyiyan pîroz kir. Kalê Helî soz da ku dê heta dilopa xwîna xwe ya dawîn li ser şopa şehîdan bin û dê hêviyên şehîdan pêk bînin.

JI BO WELAT

Dayika şehîd Baz û şehîd Serhed a bi navê Zeyneb Mihemed jî anî ziman ku ew di çavên zarokên xwe de rizgarkirina Kobanê dibîne û hestên xwe bi van hevokan anî ziman: "Du kurên min şehîd bûn. Lê ew hîna di nav me de zindî ne. Ez serbilind im ku kurên min ji bo welatê xwe canê xwe feda kir. Ez bang li hemû kesî dikim ku xwedî li xeta şehîdan derkevin. Divê heta bicihanîna xeyalên wan em têkoşîna xwe bidomînin."

Salvegera **Kobanê**

Tirkiyeyê 2 sivîl qetil kirin

Artêşa tirk a dagirker li ser sînorê Rojava komkujiyeke din pêk anî û di encamê de 2 sivîl qetilkirin û di nav de zarokek jî 6 kes jî birîndar kirin.

Li gorî agahiyên ji herêmê di sibeha 25'ê çileyê de dema ku komeke ji pêkhateya ereb hewl dida li Xizeyîl ê Serêkaniyê derbasî bakurê Kurdistanê bibe, ji hêla leşkerên artêşa tirk a dagirker ve hatin gulebarankirin. Di encama gulebaranê de 2 sivîl hatin qetilkirin û di navde zarokek jî 6 sivîl jî birîndar bûn. Welatiyên birîndar ji hêla şervanên YPG'ê ve rakirin nexweşxaneya Roj a Serêkaniyê.

Navên welatiyên birîndar wiha ne: "Xezne Mihemed (18), Fîda Casim (21) û zarokê wê yê 5 mehî Emanî Mihemed ji gundê Til Helef, Mihemed Ziêlî (22) ji gundê Zêdî, Mihemed El Hemîd (21) ji Eyn Îsayê, Nûr Ferhan (21) ji Hesekê ne." Hat zanîn ku welatî ji ling, zik, sing û di rûyê xwe de birîndar bûne. ***SERÊKANIYÊ - ANHA***

Di dilê wî yê biçûk de dinyayek heye

Mustefa li gel temenê xwe yê biçûk êşa zarokên koçber hîs dike û rojane pereyan dide ser hev û hewldide pêdiviyên koçberan pêşwazî bike.

Zarokê bi navê Mustefa Teyar (14) êşa zarokên koçber ku ji zarokatiya xwe bêpar mane, hîs dike û xercaneya xwe ya rojane kom dike û bi pereyê berhevkirî jî ji zarokên koçber re cilên zivistanê di kire.

Mustefa tevî dayik, bav, du xwîşk û du birayên ji wî biçûktir li Minbicê dimînin. Dema çavên wî bi zarokên koçber dikeve, gelekî xemgîn dibe û ji bo vê yekê jî rojane pereyan dide ser hev û pê ji wan re pêdiviyên koçberan li gorî derfeta xwe pêşwazî dike. Der barê mijarê de zarok Mustefa hestên xwe wiha tîne ziman: "Ez dixwazim alîkariya zarokên ku ji her tiştî bêpar mane, bikim."

Ji ber rewşa nebaş a malbatê her çiqas nikare gelek pereyan berhev bike jî lê ew tevî temenê xwe yê biçûk êşa zarokên koçber hîs dike û hewl dide bi derfetên heyî alîkariya wan bike. Qîrîna koçberan a ji bo cîhanê ku heta niha bêbersiv maye, Mustefayê zarok di bihîse û li gorî paqijiya van hîssên xwe di bersîvîne. ***MINBIC - ANHA***

KNK:

"Di êrîşa faşîst û hovane ya çeteyên DAIŞ'ê de tevî hemû alîkariya dewletan di serî de Tirkiyeyê, lê bi pêşengiya YPG -YPJ'ê berxwedana man û nemanê hat dayîn û Kobanê bû cihê cenga paşverûtî û pêşverûtiyê. Bi temsîliyeta ronahiyê gelê Kobanê tarîtiya DAIŞ'ê bi dawî kir û li tevahiya cîhanê bû sembola ronahiyê. Em vê rojê li tevahiya mirovahiyê pîroz dikin û banga xwedî derketin Kobanê li tevahiya cîhanê dikin."

PADÊ:

"Em salvegera berxwedana Kobanê li hemû gelê kurd pîroz kirin. Yek ji rojên herî şanaz a ji bo gelê kurd jî roja serkeftina berxwedana Kobanê ye. Her wiha serkeftina Kobanê serkeftina hemû gelan bû. Ger Kobanê bi serneketa dê mirovahî bi binketa. Bi serkeftina Kobanê gav bi gav şoreşa Rojava bi pêşket û herî dawî jî bi tevlibûna hemû gelan federaliya demokratîk hat avakirin. Gelo tiştek ji vê pêngavê pîroztir heye? Em bi van hêvî, coş û kelecanê dibêjin pêşeroj ya gelane û bijî berxwedana Kobanê."

Meclisa Rêveber a Kantona Efrînê:

"Em duyemîn salvegera rizgarkirina Kobanê li gelê kurd û Rojhilata Navîn pîroz dikin. Hemû cîhan li dijî berxwedana kurdan a efsanewî de matmayî ma. Bi Kobanê ya azad re hemû nirxên mirovahiyê hatin parastin. Ev serkeftin jî bi saya şehîdan pêk hat. Em serkeftina gelê berxwedêr ê Kobanê li hemû cîhanê pîroz dikin. Her wiha em di vê roja dîrokî de hemû şehîdên şoreşê bi rêzdarî bibîrtînin û berxwedana şervanan silav dikin."

AHMET TURK rakirin nexweşxaneyê

Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk ku piştî ji peywira xwe hat dûrxistin, hat girtin û ew birin Girtîgeha Tîpa T a Xarpêtê, hat zanîn ku li ser daxwaza Wezareta Dadê û Wezareta Tenduristiyê rakirin nexweşxaneyê. Di rapora ku ji aliye Saziya Tiba Edlî ve beriya niha der barê Turk de hat amadekirin de, hatibû gotin ku divê Turk bê berdan.

Li ser daxwaza her du wezaretan Turk rakirin Nexweşxaneya Fakulteya Tibê ya Zanîngeha Firatê ya Xarpêtê û der barê rewşa wî de tu agahî nehatin bidestxistin. XARPÊT

Wekîlên HDP'î hatin binçavkirin

Dewleta AKP'ê bê navber êrîşî parlamenterên HDP'î dike. Her roj wekîlên HDP'î tên binçavkirin, li dadgehan dozên hevşaredar û wekîlan tên dîtin û duh jî 4 wekîlên HDP'î bi darê zorê hatin binçavkirin

Li hemberî siyasetmedarên kurd operasyonên girtin û binçavkirinê yên dewleta AKP'ê didomin. Duh jî wekîlên HDP'ê Osman Baydemîr, Ahmet Yildirim, Mehmet Emîn Adiyaman û Îmam Taşçier hatin binçavkirin.

Serokwekîlê Koma HDP'ê Ahmet Yildirim û Parlamenterê HDP'ê yê Rihayê Osman Baydemir dema "Doza Sereke ya KCK'ê" li 2'yemîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê dişopandin, piştî derketina edliyeyê daxuyanî dan çapemeniyê. Piştî daxuyaniyê polîsan bi biryara 2'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê ya bi zorê binçav bikin û bînin dadgehê Yildirim û Baydemir binçav kirin û birin dadgehê. Yildirim û Baydemîr piştî îfadedayînê serberst hatin berdan.

Parlamenter Osman Baydemir, di daxuyaniyê de pirsa "polîs, dozger û dadgerên ku ev fezleke amade kirin li ku ne?" pirsî û wiha got: "Hemû ji doza FETO girtî ne. Ger ku wisa be çawa dibe ku îdîanameya darbekar amade bikin wekî delîlên sûc bên dîtin." Baydemîr anî ziman ku operasyonên li hemberî siyasetmedarên kurd zilm û bêhiqûqî ne.

Parlamenterê HDP'ê Îdirê Mehmet emîn Adiyaman li mala xwe ya Stenbolê hate binçavkirin. Adiyaman di hesabê xwe yê twitterê de bi nivîsa "Bi biryara bi zorê anînê ve niha li Stenbolê ji mala xwe hatim girtin. Min dibin Edliyeya Çaglayanê" parve kir. Adiyaman di berdewamê de jî nivîsa "piştî ku rapora bijîşk hate girtin niha anîne Edliyeya Stenbolê ya Çaglayanê dê bi SEGBÎS'ê ve îfade bide 4'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Enqereyê" parve kir.

Adiyaman derxistin dadgeha nobedar a li Edliyeya Stenbolê û bi SEGBÎS'ê ve beşdarî dadgehê bû. Adiyaman piştî ku îfade da qedexeya derketina derve hate dayîn û bi şerta kontrola edlî hate berdan.

Parlamenterê HDP'ê yê Amedê Îmam Taşçier di çarçoveya biryara bi zorê anînê ya lêpirsîna ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Amedê hatiye vekirin de dema ji mala xwe derdiket hat binçavkirin. Taşçier bi îdiaya "heqeret li serokwezîr kiriye" hat binçavkirin piştî îfadeyê Taşçi serbest hat berdan.

Doza Hevseroka DBP'ê Sebahat Tuncel û Hevşaredara Bajarê Mezin a Amedê Gultan Kişanak li 8'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Amedê hat dîtin. Heyeta dadgehê biryara berdewamkirina girtîbûna Tuncel û Kişanak da. *AMED*

Qeyûm germav jî xera kir

Qeymeqam Mehmet Şîrîn Yaşar ê ku wek qeyûm tayînî Şaredariya Erdîşê ya Wanê hat kirin, pêkanînên xwe yên ku rastî nerazîbûnên gel tê, didomîne.

Qeyûm Yaşar ê ku qiştî hat ser kar xebatên jin, ciwan û zarokan da rewestandin û tabelayên pir zimanî rakir vê carê jî li herêma geliyê Zîlanê germava li gundê Hesenevdalê da xirakirin. Germava ku welatiyên herêmê wekî çavkaniya şîfayê dibînin bi îdiaya ku PKK'ê li wir dimînin hate xirakirin.

Fesîh Hezer diyar kir ku germav di 1950'an de ji aliyê dewletê ve hatiye çêkirin û di salên 1970'an de dewrî kalê wî yê ku xwediyê wê derê bûye hatiye kirin û li gelek deverên welat ji bo ku şîfa bibînin tên germavê. Hezer wiha axivî: "Bi salan e em van germavan didin şixulandin. Li navçeya min gelek şaredar derbas bûn. Yek ji wan jî tiştekî bi vî rengî nekirin. Tenê ji ber tu cendirmeyan xwestine qeyûm jî germava me dezgehê me yê nan bi hinceta 'cihê PKK'iyan e' da xirakirin. *WAN*

Tevlîbûna merasîmê jî sûc e!

Parlamentera HDP'ê ya Amedê Nursel Aydogan a ku ji dozeke din girtî ye, bi îdiaya "endama rêxistinê ye û bi xwestek alîkarî daye rêxistinê" 4 sal û 8 meh cezayê girtîgehê hat dayîn û biryar hat amadekirin.

Di biryara ku ji 56 rûpela pêk tê û di 13'ê Çileyê de li 2'yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê hat dayîn de, lêpirsîna dozê, pêvajoya gihiştina wê û parastinên di dozê de cih girtin. Hinceta ceza jî wekî tevlî cenzayê HPG'iyan bûye, li pişt cenaze meşiya ye û "endamê rêxistinê ye û li ser navê rêxistinê sûc kiriye" hat nişandan.

Aydogan di parastina xwe ya dadgehê de tevlîbûna xwe ya cenazeyan wiha vegot: "Di wê dema merasîma cenazeyan hat kirin de ez parlamentera serbixwe ya Amedê bûm. Diviya bû em tevlî cenazeyên malbatên ku deng dane me bibin, me jî li ser vê hêviya malbatan tevlî merasîman bûn. Tevlîbûna me ji bo parvekirina êşan bû. Ez dixwazim bejim ku tevlîbûna merasîma cenaze ne sûc e."

Parêzerên Aydogan, dê biryarê li Dadgeha Edliya ya Herêmê bibin temyîzê. *AMED*

37 mamoste hatin binçavkirin

Li Kemalpaşa ya Îzmîrê tîmên taybet serê sibehê bi ser malên endamên Egîtîm-Sen'ê de girt. Di serdegirtinên malan de 37 kedkarên perwerdehiyê hatin binçavkirin. Hate zanîn ku kedkarên perwerdehiyê ji ber çalakiya karberdanê ya ku di 29'ê kanûna 2015'an de pêk hatiye hatine binçavkirin.

Navên hin kesên ku hatin binçavkirin ev in: Abdullah Aydinli, Serpîl Aydinli, Mehmet Ateş, Zurahya Ateş, Savaş Yildiz, Halîl Ozden, Arîn Emîne Kum, Ozlem Gormuş, Gulsoy Ateş, Huseyîn Şîmşek, Halîl Ozbent. ÎZMÎR

Hiqûq jî nikare îzah bike

HEVSEROKA HDP'Ê Fîgen Yuksekdag ji ber axaftina xwe ya 27'ê cotmeha 2015'an a li vekirina otogarê doza ku hatiye vekirin li navçeya Erdîşa Wanê hate darizandin. Doza ku bi îdiaya "qedexeyê hilbijartinê bin pê kiriye" hatiye vekirin li 1'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Erdîşê hat dîtin. Yuksekdag ji Girtîgeha Tîpa F a Kandirayê bi SEGBÎS'ê ve beşdarî dozê bû. Yuksekdag di parastina xwe de wiha got: "Em bi rewşekî hiqûq nikare îzah bike re rû bi rû ne. Berpirsyariya qanûnçêkirinê veguheriye neberpirsyariya qanûnçêkirinê." Doz talaqî 28'ê nîsanê bû. WAN

Qeyûm 224 karker ji kar derxistin

RIHA – Qeyûmên li Şaredariyên Wêranşar, Heweng, Pirsûs û Xelfetiyê peymana 224 peymanên taşeron betal kirin. Qeyûm li Şaredariya Pirsûsê 85 karkerên taşeron, qeyûmê Hewengê 100 karker û cîgirê qeymeqamê Wêranşarê Omer Cîmşît ê bû qeyûm 33 karker û qeymeqamê bû qeyûmê Şardariya Xelfetiyê 6 karker ji kar derxist.

Qeyûm tayînî Bazîdê kirin

AGIRÎ – Li navçeya Bazîdê ya Agiriyê, polîsan bi ser mala Hevşaredarê Şaredariya Bazîdê Rohat Ozbay de girt û Ozbay binçavkirin. Piştî binçavkirina Ozbay, li şûna wî Qaymeqam Ulaş Akhan wek qeyûm hat tayînkirin. Piştî lêgerînên li avahiya şaredariyê, li hawirdora şaredariyê polîs hatin bicihkirin.

www.arsivakurdi.org

Dê ji bo azadiya Ocalan bimeşin

Li welatên Ewropayê û rojavayê Kurdistanê gel ji bo azadiya Ocalan li ser piyan e. Kurdistanî û dostên wan ên li Îtalyayê, ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, 11'ê sibatê wek roja seferberiya ji bo azadiya Ocalan îlan kir.

Li gelek bajarên Îtalyayê wê di navbera 27'ê Çileyê - 11'ê Sibatê de civîn û çalakî bên lidarxistin. Parêzerê Ocalan Mahmût Şakar, Parlamenterê HDP'ê Faysal Sariyildiz û nûnerê KNK'ê wê weke qiseker beşdarî civîn û çalakiyên li bajarên Bologna, Fîrenze, Modena, Grosetto, Bergamo, Brescîa, Padova, Torîno û Mîlano bibin. Her wiha, beriya meşa mezin wê di 8'ê sibatê saet 11:00 de li ber avahiya Şaredariya Mîlanoyê, tevî dostên Kurd ên Îtalyayî wê daxuyaniyeke çapemeniyê bê dayîn. Ji bo meşa 11'ê sibatê wê kurdistanî bi otobusan ji bajarên Novara, Grosetto, Parma, Modena, Bologna, Torîno, Bolzano, Fîrenze, Lîvorno, Pîsa, Valsûsa, Roma, Brescîa û Napolî bi rê bikevin. ROMA

Şêniyên Efrînê tecrîda ku AKP ê li ser Ocalan ferz kiriye şermezar kirin û gotin ku ew ê têbikoşin û Rêberê xwe azad bikin. Reca Osman bang li NY û dewletên navneteweyî kir ku li ser doza Ocalan bixebitin. Hêvîn Bekir da zanîn ku dê rêberê xwe azad bikin. Jina bi navê Evîn Dênîklî wiha got: "Ocalan ji bo azadiya jinê têkoşiya. Divê jin jî ji bo azadiya Ocalan asta têbikoşina xwe bilind bike.

Rêxistina TEV-DEM`ê ya Kantona Kobanê bi armanca avakirina meclîsên gundan, ji şêniyên 25 gundên xeta rojavayê Kobanê ku wekî xeta Firatê tê naskirin re civînek organîze, kir. Pêkhateyên kurd û ereb tevlî civînê bûn û xwestin Ocalan serbest bê berdan. ROMA - KOBANÊ

Dilsozî bi demokrasiyê pêkan e

Serokê Komîteya Navendî ya TKP'ê Mûstafa Sûphî û çardeh hevalên wî, di şeva 28'ê çileya 1921'an de li Derya Reş ji aliyê Tirkiyeyê ve hatin xeniqandin û kuştin.

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mustafa Karasu destnîşan kir ku divê hêzên sosyalîst û tevgerên şoreşger ên li Tirkiyeyê, bûyere kuştina Mustafa Sûphî bi berfirehî binirxînin. Karasu wiha axivî: "Bi rastî jî eniya çepgir têkoşîneke gelekî mezin meşandiye. Lê belê ji ber kuştina Suphiyan û ji ber ku nekarî têkiliya xwe ya bi dewlet û hikumetê re bibire, hêzên çepgir nikarin xwe bigihînin armancên xwe. Ya rast, pirsgirêka bingehîn a çepgiran, siyasî û îdeolojîk e. Nexwe gelek têkoşîn û keda xwe heye. Cihê çepgiran di nava têkoşîna demokrasiyê ya Tirkiyeyê de gelekî mezin e. Di têkoşîna demokrasiyê ya Tirkiyeyê de piştî kurdan keda herî mezin ji aliyê çepgir û sosyalîstan ve hatiye dayîn. Lê belê, ji ber ku hêzên çepgir û sosyalîst bi kurdan re nebûn yek û têkoşîneke hevpar nemeşand, hêzên mîna AKP'ê ku di demokrasiya Tirkiyeyê de qet ked û têkoşîneke xwe nîn e, bûne desthilatdar. Heke hêzên çepgir, sosyalîst û kurd li hev bicivin û têkoşîna demokrasiyê bimeşînin, dê Tirkiyeya demokratîk û azadîparêz, ku daxwaza Mustafa Sûphî û hevalên wî bû, pêk were."

BEHDÎNAN - ANF

Manîfestoya mezin a 'Na'yê

Li hemberî dîktatoriya AKP'ê û Tayyîp Erdogan eniya 'na'yê berfireh dibe. HDK, Tevgera Hezîranê, EMEP, Halkevlerî dê di rojên pêş de bi hevgirtinên berfirehtir amadekariyên daxuyandina manîfestoya 'na'yê bike

YASÎN KOBULAN / NECLA DEMÎR / STENBOL - DÎHABER

Piştî guherandina makeqanûnê ji bo pêşî li pergala serokdewletiyê ango dîktatoriya Tayyîp Erdogan vekin amadekariyên referandûmê tên kirin. Ger Erdogan guhertinên meclisê erê bike dê di meha nîsane de referandûm pêk were. Muxalîf û demokrat li dijî dîktatoriyê dê di referandûmê de bêjin 'na'.

Li bajarên Tirkiyeyê, eniya "NA"yê ya bi pêşengiya HDK, Tevgera Hezîranê ya Yekbûyî, EMEP, Halkevleriyê dest pê kir, dê di rojên pêş de bi hevgirtiyên hîn berfirehtir amadekariyên daxuyandina manîfestoya "na"yê bike. Tê payîn ku, dê li Setnbolê jî wek Amedê bi awayekî hevwext deklarasyon bê daxuyandin.

Hevberdevkên HDK'ê Gulistan Koçyîgît û Onur Hamzaoglu riya ku dê di referandûmê bişopînin nirxandin. Hamzaoglu, anî ziman ku ew ê wek HDK û hevgirtiyên wê di referandûmê de li dijî guherandina rejîm û pergalê bibêjin "na" û wiha got: "Em ê ji bo aştiyê bibêjin na. Em ê ji bo astengkirina domandina OHAL'ê bibêjin na."

Hamzaoglu, destnîşan kir ku wan ji bo referandûmê koordînasyonek ava kiriye û got, di koordînasyonê de HDK, Tevgera Hezîranê, EMEP û Halkevlerî cih digirin. Hamzaoglu, anî ziman ku dê di koordînasyonê de hevgirtî li herêmê xebatên xwe bimeşînin, li navendê jî ew ê bi hev re tevbigerin û dest nîşan kir ku, ji bilî yeko yeko gerîna li malan, ew ê wê endîşeya heyî ji holê rabikin. Hamzaoglu ê got, "Divê NA'kar rojek berî rojekê bigihîjin xêr û bêra xwe û cara ewil e ku NA tişteki erênî di xwe de dihebîne" wiha domand: "Li Tirkiyeya 2017'an gotina 'erê' gava rêvekirina li ber tarîtî, paşverûtî û hemû neyîniya ye. Ji ber vê, 'erê' nîşandana tarîtiyê ye. Em baş dizanin li vê xakê ya herî zêde 'Na' ye."

'DÊ 'NA' BI XÊR BE'

Koçyîgît a got "Dê NA bibe xêr û bêr" jî anî ziman ku, îktîdara AKP dixwaze bi 'erê' Tirkiyeyê ber bi kendavê ve bibe. Koçyigit anî ziman ku, divê beriya hemû pirsan pirsa guherandina rejîmê li dijî kê çêdibe bê kirin û wiha domand: "Guherandina rejîmê ya dixwazin li ser 'erê' ava bikin, taliya talî guherandina rejîmeke ku li dijî me tê avakirin. Dê 'na'ya me ya li dijî vê bibe 'na'yek bi xêr û bêr. A rast em ji bo demokratîkbûyîna Tirkiyeyê dibêjin 'na'."

Koçyigit, got raya giştî ya Tirkiyeyê hatiye tengijandin û wiha axivî: "Îktîdara AKP'ê tim bi çewisandinî bis er civakêde diçe, bi polîtîkaya şidetê civakê diçewisîne û dixwazin bi çewisandin û êrîjan bêalternatîfiyê wek alternatîf nîşan bidin. Dibêje 'Ya hûn ê min hilbijêrin ya hûn ê min hilbijêrin.'"

Koçyigit, diyar kir ku bi guherandina makeqanûnê mebest guherandina rejîmê ye û wiha got: "Ji nû ve kaos û şîdet tê ferzkirin. A rast 'na' li dijî vana hemûyan e. Belkî beriya serdabê, NA'ya derketina dawîn e. Divê em wê na'yê bibêjin."

Kedkarên îzmîrî dibêjin 'NA'

KEDKARÊN ÎZMÎRÎ, diyar kir ku dê di referandûmê de ji bo jiyaneke birûmet bibêjin 'NA'. Kedkarê paqijiyê Riza Oz anî ziman ku ew bi her awayî li dijî pergala serokatiyê ye û wiha axivî: "Ez li dijî pergala serokatiyê me. Ji pêşeroja zarokên xwe bi fikar im. Ji xwe makeqanûna anîn dê demokrasiya me bi pêş nexe. 8 xalên ewil ên vê pêşniyarê rasterast wek ên Qanûna Bingehîn a Sûriyeyê ne. Xebatkarê paqijiyê Muhammet Eroglu da zanîn ku AKP dixwaze pergala serokatiyê bîne û padîşahiya xwe îlan bike. Karkerê paqijiyê Zafer Bozdag jî got ku bi pergala serokatiyê re dê prisgirêk çareser nebin û wiha axivî: "Li welatekî ku gelê wê wek kêmar bên dîtin, ne carekê tu hezar caran jî makeqanûnê biguherînî dê çi fêdeya wê hebe." Bozdag, anî ziman ku serokkomarê tirk Tayyîp Erdogan vîna gel nas nake. ÎZMÎR

CHP li xwe mikur hat; şaşî kiriye

Parlamenterê CHP'ê yê Yalovayê Muharrem Înce, rexneya destnedayîna parlamenteran li rêveberiya CHP'ê kir.

Muharrem Înce, ku ji Rojnameya Sozcu re axivî, bal kişand ser guhertinên qanûna bingehîn ên di meclîsê re derbas bûne û wiha got: "Divê pêvajoyê de, di mijara destnedayînan de şaştiya herî mezin helwesta CHP'ê bû. Min ji bo rakirina destnedayînê dengê 'Na' bikar anî. Rêveberiya CHP'ê li vir şaştiyek kir. Di rewşek wiha de, îktîdarek wiha heyî, dadgehên ku çong danîne hene hûn çawa dikarin destnedayînan rakin? Îro HDP'î di girtîgehê de ne. Dê sibê CHP'î bikevin girtîgehê." *ENQERE*

Ji Rojava

Astana dê bi xwe re çi bîne?

Nalîn Dîcle

Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ku navenda wî li Sûriyeyê ye, li pey xwe karesateke mezin hiştiye. Di 6 salên şerê Sûriyeyê de çi hat guhertin? Di encama vî şerî de jin û zarok jî di nav de bi hezaran kesî jiyana xwe ji dest da, gelek gund, bajarok û bajarên mezin hatin wêrankirin û bi milyonan kes neçar man ku koçber bibin. Heta niha bi milyonan mirov mexdûr bûn, Sûriye bû welatekî wêran, lê hê jî Rejima Baasê û hinek komên çete dizaynkirin û parvekarina Rojhilata Navîn heqê xwe dibînin, di gurkirina şer de israr dikin.

Heman alî li ser erdê bi hev re şerekî tund dimeşînin. Ji bo mayîndekirina berjewendiyên xwe li ser maseyê şerekî diplomatîk dimeşînin. Jixwe di civîna Riyad, Moskov, Qahîre, rêzecivînên Cenevre û Viyana û herî dawî jî Astanayê de, ji derveyî pêkhateyên Sûriyeyê hemû hêz xwedî mafê biryarê bûn. Di van civînan de her çend vîna gel û pêkhateyên Sûriyeyê nehat temsîlkirin jî, lê hêzên biyanî dixwest di van civînan de çarenûsa gelên Sûriyeyê diyar bikin.

Çawa civînên berê bi serpereştiya hêzên din ên hegemon bû, îcar jî civîna Astanayê di 23-24'ê çileyê de bi serkêşiya Tirkiye, Îran û Rûsyayê hate lidarxistin.

Çima Astana nikare çaseriyeke mayînde bi xwe re bîne?

Bêgûman gelek sedem hene ku Astana bi ser nekeve. Lê sedema bingehîn ew e ku nûnerên pêkhateyên li Bakurê Sûriyeyê xwedî vîneke bihêz in, wekî kurd, ereb û sûryan nehatin vexwendin. Ji ber ku ev hêz ji derve hatin hiştin, YPG'ê jî aşkera kir ku biryarên Astanayê wan eleqedar nakin. Ne tenê YPG'ê, bi giştî Rojava û pêkhateyên Bakurê Sûriyeyê bertek nîşanî civîna Astanayê dan.

Sedema duyemîn jî ew e; hêzen ku serkêşiya civînê dikin, esas sedemê qeyranê ne û tu projeyeke wan ji çareseriyeke mayînde re nîn e, lewre şansê vê civinê yê serkeftinê nîn e.

Bêguman qeyrana Sûriyeyê qeyraneke cihanî ye, di şerê Sûriyeyê de jî gelek dest hene. Eger ev hemû hêz li ser projeyekê li hev nekin, çareseriyek mayînde ne gengaz e. Ji beşdarên civînê jî diyar e ku lihevkirineke navneteweyî nîn e. Jixwe gelek hêzên sereke yên cihanî wekî Amerîka, Yekitiya Ewropayê beşdar nebûn. Çawa ku Tirkiyeyê nehişt nûnerên kurdên Rojava beşdarî civînê bibin, Îranê jî nehişt Siûdî û komên girêdayî wê beşdarî civînê bibin. Ev bi xwe jî nîşan dide ku lihevkirineke herêmî û navneteweyî nîn e.

Ji encamnameya civînê jî diyar dibe ku hêzen beşdarî Astanayê bûne tenê di dewamkirina dikdatoriya Esad de li hev kiriye. Her çend bi salan e Tirkiyeyê di çûyîna Esad de israr kiribe jî, lê li ser dijberiya kurdan tawîz da, herî dawî mayîna Esad qebûl kir.

Jixwe civînên Riyad, Kahîre, Moskov, Cenevre û Viyana û herî dawî jî ya Astanayê ji ber projeyeke xwe ya çareseriyeke mayînde nîn e, bi ser nakeve. Heke projeyeke çareseriyê nebe, lihevkirina agirbestên demkî, ji bo qeyrana Sûriyeyê bi qasî hebeke jankuj jî bandorê nake.

Du rêyên dijwar li pêşiya Rûhanî

GELAWÊJ EWRÎN

Bi hêviya ku dê ji rejîma xwefiroş a şahên pehlewiyan rizgar bibin, lê bi siyaseta kor û hîlebazane ya melayan, gelên Îranê ketin xewa mirinê. Bi hezaran mirov bi sûcê endamê partiyên çepgir in di girtîgehên ku gelekî ji yên SAVAK'ê (saziya îstîxbarata Îranê ya dema Şah) kêmtir nebûn de, bi hovane hatin qetilkirin. Yek ji wan kesan ku salên 80´yî û şûnve di operasyona tunekirina tevgerên şoreşgerî de bi rola herî sereke rabû, Elî Ekber Refsencanî bû ku demekê beriya niha mir an jî hat kuştin.

Ew kujerê ku bi salan û li gorî her şert û mercan maskeyek da ber rûyê xwe û wisa xelk xapand. Ji bo man û hebûna rejîma îslamî çi ji destan hat, kir. Ew reformîst û kesên demokrat ku roja me ya îro, Refsencanî wek pêşengê xwe dibînin, wî wek rêberê xwe yê tevgera reformîst dibînin, di rastiyê de ew kes in ku mirov dikare bibêje aşiqên celadê xwe ne. Îşkence û zilma celadê xwe ji bîr kirin û îro wekî ku neçar bin an jî tenê ji bo ku bijîn, hemû êşên xwe dixin bin pêyê xwe û wisa li kêleka Refsencanî cih digirin. Di merasîma cenazeyê Refsencanî de rondikên tîmsahan dibarînin.

TEVGERA MUXALÎF

Bipêşxistina tevgereke muxalîf û alternatîf nabe di bin siya xwe radestkirin û lîberalîzmê de li ser gelên Îranê were ferzkirin. Jixwe welatên derve jî wekî ku di ragihandina wan de jî xuya dike, di rastiyê de armanca wan şikandina meyla azadîxwaz a gelên Îranê ye. Bi taybetî dixwazin pêşî li têkoşîneke demokratîk û radîkal bigirin. Pergalê nekarî Îranê li gorî xwe dîzayn bike, bi taybet piştî ku şerê Îran û Iraqê jî serkeftî nebû û ew negihaştin titşê ku wan dixwest.

NETEWEDEWLETA ÎRANÎ

Hingê hewl dan bi şêwazekî din rastiya netewedewletê û şîetiyê li Rojhilata Navîn di nava hevsengiyekê de biparêzin. Ji bo ku rejîma xwe biparêze, di serî de ev rola ku modernîteya kapîtalîst dabû Refsencanî, 8 salan dewam kir. Paşê dema sala 1997'an êdî planên ji bo jinûveavakirina Rojhilata Navîn ketin meriyetê, êdî pêwîst bû rejîm hinekî din xwe nerm bike, ji bo ku temenê xwe dirêjtir bike. Wekî ku li dijî Refsencanî ye, Mihemed Xatemî hat ser desthilatdariyê. Di rastiyê de Xatemî kirasê Refsencanî li xwe kir û wisa 8 salan desthilatdariya xwe domand.

Piştî ku rejîmê dît pêla têkoşîn û meylên azadiya gelan a li dijî rejîmê zêde dibin, nû pê hesiya ku ev şêwazeke rast nabe ji bo dewama dîktaya xwe. Ji bo wê jî dema Mehmûd Ehmedînijad dest pê kir. Mehmûd Ehmedînijad di rastiyê de rûyê rast ê vê rejîmê ye. Hilbijartina piyon de rejîmê şaşiyeke mezin kir.

DANEKIRINÊN NAVNETEWEYÎ

Tam di demeke wisa de bû ku li ser Îranê ambargoyeke navdewletî hebû. Bi firotina zêr û petrolê bi dizîka Ehmedînijad hewl da Îranê ji vê rewşê xilas bike, lê nekarî. Niha kesek wek Babek Zencanî bûye qurbanî û li benda bena sêdareyê ye, lê di rastiyê de ne ew, yên ku heta qirikê di gendeliyê de fetisîbûn, wezîrên Ehmedînijad bûn ku ew jî hemû endamên artêşê û girêdayî rêberê Îranê Xamineyî ne. Ji bo wê, hema dixwazin bi lez û bez Zencanî bi dar ve bikin ku ew jî mijareke din a sosret e.

Hesen Rûhanî bi dirûşma 'hêvî û tedbîr'ê hat ser desthilatdariyê. Wer ku dê wekî Erdogan her tim hêviyê bide xelkê lê li hemberî serîrakirina gel jî bi tedbîr û hişyar be. Ji ber ku gel gelekî ji desthilatdariya Ehmedînijad westiyabû û hatibû ber teqînê. Jixwe sala 2009'an pêla serhildana gel dest pê kir lê dîsa hat tepeserkirin. Rûhanî dîsa dê di hilbijartinên meha Gulanê de wek namzed bikeve hilbijartinê. Wer xuya dike ku dê bi ser bikeve ji ber ku reqîbên wî yên din xurt nîn in. Lê neçar e rêya xwe hilbijêre, zextên du aliyan li ser hene û daxwazên demokratîk ên gelên Îranê jî zextê lê dikin.

MIRINEKE BIGUMAN

Ji ber rewşa heyî ya li Rojhilata Navîn dibe ku Refsencanî ku xwe wek pêşengê reformîst bi nav dike, piştgiriyeke mezin bida Rûhanî û wisa Îran ber bi guhertinên bingehîn ve bibira. Ji ber ku beriya bimire, behsa guhertina qanûna esasî ya Îranê kir. Ev balkêş e ku piştî wê hema mir, mirineke biguman e, ji ber ku guhertina qanûna esasî li Îranê dê were wateya guhertina rejîma Wilayetê Feqîh û bêbandorkirina muhafazekaran ango Xamineyî.

Şerê desthilatdariyê û bîr û rayê li Îranê sala 2009'an dest pê kir, mezin bû û gihaşte lûtkeyê ku mirov dikare bibêje Refsencanî qurbanê yekem ê vî şerî bû. Du rêyên dijwar li pêşiya Rûhanî hene. Ji bo Îraneke demokratîk jî ya herî rast ew e ku Rûhanî ne pişta xwe bide muhafazekaran ne jî tevgerên ku xwe wek reformîst bi nav dikin, lê xizmeta rejîmê dikin. Pejirandina mafê hemû gelên Îranê bi taybetî kurdan, dê destê Rûhanî xurttir bike. Nexwe ew ê jî wekî Refsencanî û Ehmedînijad bibe qurbanî.

Berhema Ebû Leyla: Pêşerojeke AZAD

Zarokên fermandar Feysel Ebû Leyla ku di nameyekê de digot wî canê xwe ji bo pêşeroja hemû zarokan feda kiriye dibêjin ku wan bavê xwe di xewna xwe de dîtiye û bavê wan ji wan re gulan tîne

NESRÎN EBDÎ / KOBANÊ - ANHA

Di hewaya sar de piştî belavbûna ji dibistanê li xwîşka xwe ya biçûk digere, bi destê wê digire û berê xwe didin malê. Di pêşerojeke azad de ku bavê wan jê re hiştiye, bi xeyala bavê xwe dijîn.

Endamê Meclisa Leşkerî ya Minbicê û fermandarê Tabûra Şems El Şemal Feysel Ebû Leyla ku di operasyona rizgarkirina Minbicê de birîndar bûbû û di 3'yê hezîrana 2016'an de jiyana xwe ji dest da, beriya şehadeta xwe, ji keçika xwe Leylayê re nameyek nivîsandibû. Ebû Leyla di nameya xwe de wiha bangî keça xwe kiribû: "Ez ê ji bo te û zarokên wekî te şer bikim. Ji bo ku zarokên van axan di pêşerojeke xweştir û azad de bijîn, em sîngê xwe didin ber hemû talûkeyan."

Ebû Leyla di her kêliyeke berxwedan û rizgarkirina Kobanê de cih girt û dema şerê rizgarkirina bajarê xwe Minbicê dimeşand, şehîd bû lê soza xwe jî bi cih anî. Hevalên wî yên têkoşînê bajarê wî jî rizgar kir û ji bo zarokên wî û yên wekî wan pêşerojeke azad ava kir. Îro li Minbic û Kobanê bi hezaran zarok bi awayekî aram dijîn û dixwînin.

Zaroka Ebû Leyla ya mezin a bi navê Leyla ku 8 salî ye jî, îro xeyala bavê xwe pêk tîne. Leyla li Kantona Kobanê bi xwîşka xwe Rehefa ya 7 salî re, çenteyê wan li milên wan her roj diçin Dibistana Şehîd Gulistan. Her du xwîşk di pola yekemîn de fêrî nivîsandin, xwendin û strandina bi zimanê dayikê dibin.

'Navê min Rehef Feysel Seîdûn e'

Li Dibistana Şehîd Gulistan a nêzî mala wan, em çûn serdana her du xwîşkan. Destpêkê bi şermokî em pêşwazî kirin. Paşê Leylayê sedema vê yekê wiha vegot: "Ez ji ber rojnemevanan direvim, carekê dîsa hatin mala me lê min xwe veşart. Diya min bang kir jî ez nehatim."

Lê keçika biçûk Rehef hîna serbestir bû. Wê dest pê kir û tîpên ku li dibistanê fêr bûne rêz kirin. Paşê jî pirtûka xwe vekir û navê xwe nîşan da. Bi dengekî berz got: "Navê min Rehef Feysel Seîdûn e."

Mamosteya her du xwîşkan Leyla Xito anî ziman ku asta wan baş e û herî zêde jî ji waneya wêneyan hez dikin. Li ser wêneyên ku xêz dikin mamosteya wan wiha dibêje: "Hin caran mala xwe ya berê xêz dikin, an jî dema malbatê resim dikin Leyla bavê xwe dixe nav lê Rehef dibêje 'niha baba çûye, ger were ez ê wî jî resim bikim."

'Ez ê ji te re gulekê bînim'

Rehef ku herî zêde bêriya bavê xwe dike dibêje; 'Min carekê bavo di xewna xwe de dît. Ew dibêje ez ê herim gulekê ji te re bînim."

Çar zarokên Ebû Leyla hene û di her firsendê de tevî dayika xwe diçin goristanê. Leylaya biçûk wiha behsa serdana dawîn dike: "Ez cara berê çûm, min kêla bavê xwe paqij kir û dora gora wî sererast kir."

Keçika biçûk Rehef jî her çend gelekî bi bavê xwe re nejiyabe û bîranên wan ên hevpar çênebûbin jî, her cara ku diçin goristanê, bi awayekî teqlîda bavê xwe dike.

www.arsivakurdi.org

Bakur li Almanyayê tê nîşandan

BELGEFÎLMA 'BAKUR' a li ser gerîlayên PKK'ê hatiye kişandin, li Almanyayê di sînemayan de ye. Tê payîn ku ji derhêneran Ertugrul Mavîoglu jî beşdarî pêşandanê bibe. Belgefîlma Bakur jî wek belgefîlma 'Her Şer Bû Jiyana Min' a der barê şoreşgera jin Sakîne Cansiz de hatibû kişandin, li Tirkiyeyê di 34'emîn Mîhrîcana Fîlman a Stenbolê de hatibû qedexekirin. Belgefîlm di sala 2013'an de li herêmên Amed, Dêrsim û Botanê hatibû kişandin. Di belgefîlmê de ji derveyî gerîlayên HPG'ê, rêveberên PKK'ê yên wekî Cemîl Bayik, Murat Karayilan, Bahoz Erdal û Mustafa Karasu jî cih digirin. BERLÎN

Bi strana Stêrkên Şehîdan tên

Navenda Çand û Hunerê ya Medyayê ya Dîlokê (NÇM), bi biryarên KHK'ê hat mohrkirin, lê dîsa Koma Siyajîn a giredayî NÇM'ê bi strana 'Stêrkên Şehîdan' a nêvî maye xebatên çand û hunerê didomînin. Endamê Koma Siyajîn Ahmet Ak diyar kir ku piştî saziya wan hat girtin zêdetir bi bawerî dixebitin û strana 'Stêrkên Şahîdan' jî mînaka xebatên wan in.

Navçenda Çand û Hunerê ya Medyayê ya Dîlokê (NÇM) wek sedan komele û saziyên kurdan bi biryarên KHK'ê hatin girtin. NÇM'a Dîlokê di 22'yê mijdarê de bi KHK'ên 677 û 678'an hat girtin. Piştî NÇM hat girtin, dest danîn ser amûrên wan ên muzîkê. Lê NÇM'ê dest ji xebatên xwe berneda û xebatên xwe li cihên cuda dan meşandin.

Xebatkarên navendê karên xwe yên nîvcomayî berdewam dikin. Strana 'Sterêkên Şehîdan' yek ji wan berheman e. Her çendî deriyê avahiya NÇM'a Dîlokê hat mohrkirin jî xebatên xwe yên çand û hunerê berdewam dikin. Koma muzîkê ya Siyajîn jî di bin banê NÇM'ê de xebatên xwe ya nîvcomayî dimeşînin.

Endamên Koma Siyajîn dema berhema strana ji bo endamên Yekîneyên Parastina Sivîl (YPS) Çiyager û Roza ku di şerê li Sûra Amedê de jiyana xwe ji dest da amade dikir, avahiya wan hat mohrkirin û xebata wan nîvco ma.

DI ADARÊ DE DERDIKEVE

Koma Siyajîn bi qasî mehek û nîv e dîsa dest bi provayên stranê kir û plan dikin ku heta meha adarê stranê temam bikin û klîba wê jî bikişînin. Endamê Koma Siyajîn Ahmet Ak (21) diyar kir ku her çend cihê wan û amûrên wan hatinbin destserkirin jî ew tên cem hev û bi baweriyeke xurttir karê xwe didomînin. Ak anî ziman ku tiştê ew aciz kirin, kilît li çandê xistin û amûrên wan desteser kirin û wiha axivî: "Xebatên çandê ne tenê di cihekî girtî de tên kirin. Her çend kilît li deriyê me xistibîn jî nikarin me rawestînin. Sterêkên Şehîdan jî ji bo vê mînak e." *DÎLOK - DÎHABER*



Tembûr û erbane di çanda kurdan de xwedî taybetmendiyên girîng in û hema bêje hezar sal e li ser erdnîgariya Mezopotamya û Kurdistanê hatine bikaranîn û di çanda gelan de xwedî taybetmendiyên sereke ne

Tembûr û erbane bo Apê Zulkuf taybet in

Zulkuf Yoldaş li Sûra dîrokî ya Amedê, di dikaneke biçûk de ev 30 sal in bi çêkirina erbaneyan ve mijûl e. Erbaneyên wî li derveyî welat jî tên firotin. Hostayê erbaneyê Yoldaş der barê jiyan û hunera xwe de ji IMPNewsê re axivî.

Yoldaş got ku "Dema tu bibêjî Hozan Zulkuf, hemû kes min nas dikin" û ev tişt li axaftinên xwe zêde kir: "Ez li Pîrana Amedê ji dayik bûme. Em kirmanc in, lê koka me soran e. Navê bavê min Elî Memkî Soran e. Dema ku ez 5 salî bûm, malbata min koçî Sûrê kir. Zarokatî û ciwaniya me li wê derê derbas bû. Ev deh sal in ku min li vê derê dikan vekiriye."

Yoldaş li Bismilê xwendiye. Ew 15 salan çûye medreseyê, di vê derbarê de jî ev tişt got: "Li Bismilê bi navê Seyda Ebdûlsemed alimek hebû. Min li cem wî xwend û hemû ilmê xwe yê dînî ji wî fêr bûm. Her wiha min demekê meletî jî kiriye."

Yoldaş bal dikişîne ser têkiliya xwe û hunermendiyê û wiha pê de çû: "Ez hozan û helbestvan im. Bi salan e ez hozaniyê dikim. Demekê Aşiq Weysanî û Eyşe Şan hebûn. Her duyan jî koça dawîn kiriye. Ji bilî min kesekî din ku vî karî bike tune ye. Stranbêj zêde ne, lê di beşa hozaniyê de ez tenê me li Amedê."

Yoldaş der barê hozaniya xwe de behsa serpêhatiyeke xwe jî dike û aşkera dike ku rojekê hozanek ji diyarê Yûsiv hatiye û wiha axivî: "Hatibû gazînoyê û ez temaşa kiribûm. Hat cem min û got ku 'em devjeniyê bikin.' Min jî got 'baş e' û min jê re got: 'Heger ez bi ser bikevim, ez ê tembûra te ji te bistînim. Lê heger ez bi ser nekevim, ez ê tembûra xwe bidime te.' Wî jî qebûl kir. Me nîv saetê bi stran û gotinan devjenî kir, avêt ber hev. Di encamê de ez bi ser ketim. Min tembûra wî jê stand. Min dît gelekî xemgîn bû, min dîsa tembûra wî da wî."

Kalê Zulkuf bi çîrokeke balkêş bahsa têkiliya xwe ya bi hunera tembûrê re jî dike û aşkera dike ku şevekê kalemêrek tê xewna wî û ew di şevekê de wî fêrî tembûrê dike. Wê demê ew jî diçe Stenbolê û li wir ji xwe re tembûrekê dikire. Ew li Stenbolê 5 salan li girava Heybeliyê dimîne û xwe di hunera tembûrê de bi pêş dixe. Li gel Eyşe Şanê tev li gelek konseran dibe. Li Amedê 70 salan di gazinoyan de dixebite, di vê derbarê de jî van agahiyan dide: "Wê demê Îbrahîm Tatlises dihat cem min û min şevekê ew derxist ser dikê. Min ji bo Tatlises bername çêdikir. Azer Bulbul jî dihat cem min. Min gelek awazên xwe dan Azer Bulbul û Ceylanê."

Yoldaş bi salan bi helbestvaniyê re jî mijûl bûye û dibêje 19 pirtûkên wî yên helbestan hene. Ew ji sala 1966'an û vir ve helbestan dinivîse. Wî 3 kaset çêkirine û beşdarî gelek konseran bûye.

ROJÊ 150 ERBANE

Yoldaş piştrast kir ku ew karê erbanê ji bavê xwe fêr bûye û got: "Bavê min gelekî baş li erbanê dixist. Wî ez fêrî hunera erbanê kirim. Wî erbane jî çêdikirin. Ez jî 30 sal in erbaneyan çêdikim. Lê em her du jî heman rêbazan bi kar naynin. Wî erbane bi rêbaza dirûtine çêdikirin, ez erbaneyan bi hev ve diçespînim."

Yoldaş destnîşan kir ku wî heta niha bi hezaran erbane çêkirine, erbaneyên wî li Çîn, Hollanda û Almanyayê jî tên firotin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Hevalekî me yê gerok heye. Ew erbaneyên min dibe Çînê û difiroşe. Erbane ferhenga bav û kalên me ye. Ji bilî min kesekî din vî karî nake û li Amedê tenê hostayekî erbaneyê heye; ew jî ez im." *AMED*

Xecê amadekariya klîbekê dike

Stranbêja jin a ji bakurê Kurdistanê Xecê Herdem dê klîba berhema xwe ya nû ya bi navê 'Çavken' bikişîne. Hunermenda ciwan ji bajarê Mûşê ye lê niha li gel du xwişk û birayekî xwe li Mêrsînê dijî. Stranbêja kurd Xecê 6 stranên bi kurdî û 2 stranên bi tirkî nivîsîne. Her wiha li çend welatên Ewropayê jî derketiye ser dikê û konser jî dane. Hunermenda ciwan der barê xebatên xwe de axivî û ev tişt got: "Rêzekonserên me li bakurê Kurdistanê, Tirkiye û Ewropayê hene. Heke derfet hebin li Hewlêrê jî em ê konserekê didim." AMED

Gurzek Çîrok Ji Herêma Serhedê

Di salên dawîn de bi pêşketina saziyên kurdistanî re xebatên der barê zimanê kurdî de jî bi pêş dikevin. Ji van kedkarekî zimanê kurdî jî Nîhat Oner e û Oner li herêma Serhedê xebatên der barê çîrok, destan û kilamên kurdî de dimeşîne, gelek berhemên çanda kurdî di bin navê 'Gurzek Çîrok Ji Herêma Serhedê' de berhev kirin û pêşkêşî xwendevanên zimanê kurdî kirin. Pirtûk ji Weşanên Avestayê di sala 2016'an de hatiye çapkirin û ji 264 rûpelan pêk tê. Xwendevan dikarin xwe bi rêya weşanxaneyên kurdistanî bigihînin pirtûkê. AMED



Hunermend Mamlê hat bibîranîn

Li bajarokê Qeladizê yê Silêmaniyê bi dirûşma 'Bîranîneke Nemir' hunermend Mihemed Mamlê hat bibîranîn. Hunermend Mihemed Mamlê berî 18 salan çûbû ser dilovaniya xwe û bi beşdariya gelek welatiyan bi konserekê hat bibîranîn.

Konser ji aliyê koma muzîkê ya Qeladizê ve hate dayîn. Rêveberiya navçeyê, malbata hunermend Mamlê, welatiyên herêmê û gelek hunermed jî beşdarî konserê bûn.

Rêveberên koma muzîkê ya Qeladizê diyar kir ku wan ji bo wefadariya hunermend Mamlê, pêwîstî bi konsereke bîranînê dîtiye û bi vê armancê şahiya xwe pêk aniye û wiha got: "Hunermend Mamlê û malbata wî her tim serdana Qeladizê kiriye û li vê herêmê tên naskirin. Mamlê li herêma Qeladizê hem kesayetiyekî taybet e û hem jî gelekî tê hezkirin."

Di bîranîna hunermend de kurê Mamlê, Çiya Mamlê jî cih girt û der barê bîranînê de hêstên xwe wiha parve kirin: "Em her sal çalakiyên bîranînê li dar dixin. Lê îsal ji salên din cudatir e, cudahiya wê jî ev bîranîn li bajarê Qeladizê hatiye lidarxistin. Ji ber ku Qeladizê li gel malbata me cihekî taybet e."

Çiya Mamlê got ku bavê wî tenê nirxekî malbata Mamlê û xizmên wî nîn e, nirxê tevahiya gelê kurd e û der barê xelata hunermend Mamlê ya salane de jî ev tişt anî ziman: "Bi kêfxweşî dikarim bibêjim ku me xelata îsal daye hunermend Mezher Xaliqî. Ji ber çend sedemên şexsî nekarî beşdarî vê bîranînê bibe ku em bikarin xelatê bidinê. Lewma me biryar da ku di havîna îsal de li welatê Swêdê ve xelatê pêşkêşê wî bikin." QELADIZÊ -ROJNEWS

Şerê Kobanê de 2 şerwanî:

Ocalan Amara û Kandîl Yilmaz

SÎNAN DENÎZ / KOBANÊ - ANF

Ewro serrgêra Azadbîyayîşê Kobanê yo. Xoverdayîş û serkewtişê Kobanê bi fedakarîya merdiman ame qezenckerdiş. Şero ke 15ê êlula 2014 de dest pêkerd û 26ê çileyê 2015 de bi serkewtiş netîce bî. Na hîkaye eynî wextî de hîkayeya serkewtişî ya. Çîyê ke bîyî sebebê azadbîyayîşê Kobanê çi teyara, çi tanq û top bî; çîyo ke bî sebebê azadîye merdimo bawerkerde bî.

Şervanê YPGyî Ocalan Amara û Kandîl Yilmazî ke xoverdayîşê Kobanê de ca girewtbî, serrgêra Azadbîyayîşê Kobanê de wina vatî: "Netîceyê xoverdayîşê Arîn Mîrkanan de Kobanê rizgar bîye"

Merdimê ke no oxir de canê xo dayî, zerrîya şaranê dinya de nameyê xo neqişnayî, yê mendî zî bi hawayo nîmcet mîyanê şorişî de xebatanê xo domnenî. Ocalan Amara û Kandîl Yilmaz zî nînan ra 2 kesî. Her di zî domanê Kobanê yî.

KURDÎ MECBÛR NÎYÎ

Ocalan Amara serra 1994 de dewa Xizine ya Kobanê de mîyanê keyeyêko feqîr de yeno dinya. Seba ke problemê ekonomîkî yê keyeyî estî, keyeyê ci ancax eşkeno 2 serran ey bierşawo mekteb. Yew xalê Amarayî zî serra 2009 de Kurdistan de merdo. Keyeyê Ocalanî nizdîyê Reqqa de dewêk de bica beno û ewja de mîyanê hêgayêk de xebetîyeno. Keye wexto ke Reqqa hetê çeteyan ra yena girewtiş ra ver reyna koçê Kobanê keno. Keye senî ke agêreno Kobanê, Ocalan Amara zî beşdarê YPGyî beno. Ocalan Amarayî qiseykerdişê xo de vano 'Wexto ke ez Reqqa de bîya, mi bi hawayo baş dî û fam kerd ke kurdî mecbur nîyî ke tim bêrî pelçiqnayîş û raştê heqaretî bêrî.' Amara perwerdeyê xo yê sifteyîn Kobanê de vîneno. Dima ra Amarayo ke beşdarê şerê Girê Sipî û Sirrînî beno, wexto ke tecrubeyêk qezenc keno, cepheyê ke Kobanê rê benî tehdît mîyan de ca gêno."

2 REY BIRÎNDAR BENO

Amara Ocalanî dewamê qiseykerdişê xo de wina va: "Çeteyê ke na herême de bî, hemînan zî waştêne ke Kobanê bigirî. Seba nê waştişê xo zî bajarokanê Sirrîn û Girê Sipîyî xebetnayênê. Dima ra dest bi hêrişan kerdî û mi heta 25ê teşrîna peyêne pawitişê rojhelatê bajarî de ca girewt. Mi nizdîyê 2 aşman meterîsan de xebate kerd û dima ra ez linga xo ra birîndar bîya, la embazêk mi şehîd kewt. Ez seba tedawî derbazî Vakurê Kurdistanî bîya û mi ewja de aşmêk tedawî dî û ez agêraya. Wexto ke ez agêraya, mi dî ke Kobanê de însîyatîf kewtbî destê embazanê ma û ez zaf kêfweş bîya. Ma êdî merkezê Kobanê de vera çeteyan de dest bi hemleyê hêrişan kerd. Wexto ke ma merkezê bajarî rizgar kerd, ma dest bi hemleya azadkerdişê dewan kerd. Tîya de yew fabrîkaya ke wextê fransîyan ra mendbî, estbî û wexto ke ma waşt na fabrîka bigirî ez reyna birîndar bîya. Mi reyna Vakurê Kurdistanî de nizdîyê 4 aşman tedawî dî û dima ra mi xoverdayîşê Kobanê de cayê xo girewt."

KEYEYÊ CI NÊVERDANO

Amara Ocalanî dewamê qiseykerdişê xo de yê ke vatbî 'do Kobanê 3 rojan de bikewo' ard vîr û wina domna: "Çend aşmî dima yê ke wina vatbî, na rey îtîraf kerdî û vatî 'ma têk şîy'. No bi xoverdayîş virazîya. Yê ke xo kerdî bombe û mîyanê dişmenî de teqnayî, embazê cinî bîy. Embaze Arîn hêzê cinîya kurdî bîye. Ma verê seba girê Kanîya Kurda û dima ra seba azadkerdişê dewan dest bi hemleyan kerd. Her kes zanayêne ke do kurdî Kobanê de qezenc bikerî, tena dewleta tirk nêyî qebul nêkerdênê."

PAWITIŞÊ KOBANÊ

Xoverdakarêko bîn yê Kobanê Kandîl Yilmazo ke nameyê ci yê rastikên Hawar Ahmet Îbrahîm o. Yilmaz dewa Şex Kamerî ra yo û 2 wayî û 3 birayê ci estî. Wayêk ci zî mîyanê YPJyî de ca gêno. Yilmaz o ke 5 serran şîyo mekteb, pîyê Yilmazî zî xizmetê xoverdayîşî de ca girewto û o zî nika dezgehê lojîstîkî de xebatanê xo domneno. Yilmaz o ke verê cû sereyê xo ra birîndar bîyo, nika qiseykerdiş de keweno zehmetî. Yilmazî wextê xoverdayîşê Kobanê de heme meterîsan de kedêka girde dano. Yilmaz dîyar keno ke 'şerwanan de tena sîlehê Kalaşnîkofî estbî û tena sîlehêko giran estbî, doçkaya 57î bî. O zî destê mi de bî.'

Yilmaz dewamê qiseykerdişê xo de vano 'ma dima ra dest bi azadkerdişê dewan kerd' û dima ra guleyê doçkayî mîyanê sîlehî de xitimîyeno û netîceyê teqayîşê guleyî de birîndar beno. Yilmazo ke tedawîya xo ra dima agêreno Rojawanî, wexto ke ma ey ra pers kenî 'şer senî bî?' o zî bi kurmancî vano 'baş bî'. Dima ra wexto ke ma persê 'Ya ti şehîd bikewtêne se bîyêne?' pers kenî, vano 'problem nîyo'.

Hem Ocalan Amara û hem zî Kandîl Yilmaz Mala Birîndaran ke şerwanê birîndar tede manenî û tedawî vînenî de manenî. Yilmazo ke mîyanê şerî de ca nêgêno, şerê heme meterîsan taqîp keno û her serkewtişî ra dima rîyê ci de hûyayîş hîna zêde beno.

Ganî cepheyê demokrasî bêro awankerdiş

ZAZA CEBELÎ

Seba ke qanûno bingeyîyê neweyî meclîs de ame qebulkerdiş, enka zî tarîxê referandûmî dîyar bî. Heme ravêreyîya Tirkîya seba qanûno bingeyî yê neweyî de raydayîşî referandûmî rê kilît bîy.

Cepheyê îqtîdarî de MHP û AKP estî û kinarê muxalefetî de cepheyê demokrasî estî. Ewta de esil babete verba faşîzmê AKP de senî hewa yew cepheyê demokrasî virazîyeno. Faşîzmê AKP ana aseno ke hewndê xo de xeyalê sultaneya Osmanî veynenê. Çeteyê Qesra Beştepe zî wazeno ke nê xeyalê hewndê xo bi rewşa raştî ra bivirazo. Nê warî de zî AKP tam gaz şona. Çimkî no het de sewbîna weçîniteyê înan zî nêmendo. Ya hukumdareya sultaney û nazî rewşa rijîyayîşê AKP. No sebeb ra yo ke her roje muhaqaq yew babeta kaosî virazenê.

Çîmkî nê rewşa kaosî ra weye benê. Nazî sewbîna tewr çem û çem şîyênê. Şarê tirk ser ro rewşa damara nîjadperestî xebitnenê û na damare ser ro xo weye kenê û pay ra vindenê. Tabî çeteyê Qesra Beştepe her wextî de û her game de herbê îstîklalî yê neweyî fekê xo de hînê cawitişê vîncî kerdo.

Ana hewa yew rewşe ser o şarî xapêneno. No het de şarî weş xapêneno zî. Enka zî heme rewşa xo girêdayeyê raydayîşê referandûmî kerdo.

La rewşa OHAL de senî hewa yew raydayîşê referandûmî beno?

Nê warî de ana aseno ke rewşa demokrasî de yew raydayîşê referandûmî tikê zor o. Çimkî no çete heme çî bi hewayêko xo keno. Heyana aşma referandûmî de heme muxalîfan, sorişgeran, demokratan tepîşeno keno zindanan. Hînê badî zî bi asanî ra estora xo heme cayan de xar dano. Sindoqanê referandûmî de heme merdimanê xo roneno û heme tewir dek û dolaban virazeno. No çete heyana eyro heme çî bi rewşa zorakî û xespkerdişî ra keno destê xo. Ewta de esil babete verba faşîzmê AKP de xoverdayîşê cepheyî yo. Eke sazkerdişê nê cepheyê şorişgerî bivirazîyo, nê warî de serkewtiş virazîyeno. Encax no tewir yew rewşe verê faşîzmê AKP gêna. Sewbîna tewir zî no kaos û krîz mîyanî de raydayîşê referandûmî qet weş nêbeno. Rewşa OHALî xo ser o yew problemêko gird a. Çimkî na rewşe de heme çî hewayê xo keno.

Eke keyfê înan nêro Kurdistanî de raydayîşê referandûmî nêvirazîyeno. Çimkî nê warî de problemê mana zaf î. No sebeb ra zî raydayîşê referandûmî ra zafêr ganî cepheyê demokrasî bêro viraştiş.

Qabê şarê kurdan ra çîyo en muhîm rewşa Rayverê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ya. Nê heme probleman mîyanî de rewşa Rayver Apoyî werte de yena vîrîkerdiş. Ewropa de seba Rayver Apoyî yew xebata çalakîya rêxistinî esta. La Vakûrê Kurdistanî de hema yew xebate çinî ya. No het de OHALî verê ra herêma Kurdistanî de heme çalakîyan qedexe kerdo. No sebeb ra zî şar nêeşkeno ke xo têdo. La enka propagandaya qanûno bingeyî yê neweyî de şarê kurd eşkeno na xebate referandûmî ra pîya seba Rayverê xo heme tewir çalakîyan bivirazo. No het ra zî awantajêko gird o. Ganî şarê kurd nê aşma wisarî de heme hedreyîya xo bivirazo.

Vatişê ‘ya’ krîzê îqtîdarî hîna kûr keno

Çarçeweya OHALî de bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî (KHK) xeylê karkerî karê xo ra ameybî îxraçkerdiş. Karkerê ke bi KHK karê xo ra îxrac bîyî, nika bêkar î. Nînan ra di kesî zî Semîh Ozakça û Nurîye Gulmene yî.
Semîh Ozakça û Nurîye Gulmene 66 rojî yo ke cadeyê Yukselî ser de grevê roniştişî kenî. Babete ser o Semîh Ozakçayo ke Şemrexê Mêrdînî de mamosta bî û 9ê êlule de gureyê xo ra amebî îxrackediş, qisey kerd.

TÊKOŞÎNÊ MA ŞERÊ ÎRADE YO

Semîh Ozakçayî qiseykerdişê xo de wina va: “Ez seba grevê roniştişî ameya Anqara. Prosesî mi ser de zaf tesîr kerd. Keyeyê mi Mêrdîn de bî, ez zî Eskîşehîr de bîya. Cinîya mi zî ameye îxrackediş labelê dima ra reyna tepîya ameye girewtiş. Bedelê her çîyî est o. Xoverdayîş û têkoşînî de zî bedel est o. Eke ez keye de bironiştêne mi do bedelê psîkolojîk bidayêne. Vera heme probleman de çareserî xoverdayîş a. Eke ma xover nêdî do waştişê îqtîdarî bibo.”

ÎQTÎDAR MÎYANÊ KRÎZÎ DE YO

Semîh Ozakçayî bale ant kampanyaya ‘Nê’ ser û qiseykerdişê xo wina qedêna: “Welatê ma bi faşîzm îdare beno. Seba qedîyayîşê zextan ganî sere de faşîzm biqedîyo. Çîyo ke keweno milê ma ser de têkoşîn o. Îqtîdar seba ke serê lîşinîya xo bigîro, bedilnayîşê qanûno bingeyî viraşt. Ez nêfikirîyena ke ‘ya’ bivejîyo. Îqtîdar mîyanê krîzî de yo. Seba qedîyayîşê krîzî ganî ma vajî nê.” ANQARA - DÎHABER

Kobanê kelaya xoverdayîşî ya

Şervanê MLKPyî yo ke serkewtişê xoverdayîşê Kobanê de ca girewt, serrgêra 2. ya azadbîyayîşê Kobanê de qisey kerd û wina va: “Serkewtişê Kobanê seba çeteyanê DAIŞî destpêka peynîye bî û Kobanê kelaya xoverdayîşî ya”

MAHÎR YILMAZKAYA / KOBANÊ - ANF

Bajaranê Rojawanî ra Kobanê netîceyê şerê giranî yo 5 aşman de 26ê Çileyê 2015 de bi temamî destê çeteyan ra ame rizgarkerdiş û ewro sergêra 2. ya Azadbîyayîşê Kobanê ya. Wextê şerê Kobanê de seba ke Kobanê de erjê merdimîye ameyêne pawitiş, sere de çar parçeyanê Kurdistan û dima ra heme hetanê dinya ra kesî ameyî beşdarê xoverdayîşî bîbî.

Babete ser o şerwanê MLKPyî Cudî Firato ke Şengal, Kobanê û herêmanê tewir bi tewir yê Rojawanî de ca girewto, qisey kerd.

Şerwanê MLKPyî Firatî va ‘hêzê emperyalîstî polîtîkayê xo yê kaosî hêrişanê 11ê êlule kerdî mehne û gam bi game kerdî dewre’ û wina domna: “Proseso ke Amerîkaye Afganistan de dabî destpêkerdiş, ewro Lîbya, Îraq û Sûrîye de dano domnayîş. Welatê sey Amerîka, Tirkîya, Katar û Erebistano Siûdî vera rejîmê Baasî de piştî danî hêzê dînperestanê radîkalan û bi no hawa kaos vejenî û no kaos hema zî dewam keno û beno sebeb ke Rojhelato Mîyanên de her vîste de dengeyî bibedilyî.”

WAŞTÎ ÇIN BIKERÎ

Firatî dewamê qiseykerdişê xo de va ‘sere de dewleta tirk û heme hêzê emperyalîstî waştî ke Şorişê Rojawanî bifetisnî’ û wina va: “Seba ke sîstemê kantonî seba heme şaranê bindestan rê alternatîfêk bî, dewleta tirk nêyî ra eciz bîye û bi çeteyan hêrişê şorişî kerd. Vera hêrişê ke 15ê êlule de dest pêkerd de şerwanê YPG û YPJyî destanêka gird nuştî. Wexto ke hema serkewtiş nêamebî qezenckerdiş, şorişgerê sey Arîn Mîrkane, Paramaz Kizilbaş, Gever, Hebûn Dêrik û Vîyan Peymane bi xoverdayîşê xo heme dinya dormeyê Kobanê de kom kerdî. Hêrişê ke hetê çeteyanê DAIŞî ra ameyî kerdiş ver Afganistan ra heta Afrîka, Ewropa, Avustralya û Amerîkaya Latînî merdimî weriştî lingan ser de.”

DESTPÊKA PEYNÎYE

Firatî qiseykerdişê xo de va ‘serkewtişê Kobanê eynî wextî de destpêka peynîya çeteyan bî’ û wina dewam kerd: “Ez 3 serrî ra ver zî tîya de bîya û ewro reyna agêraya tîya; cok ra ez zaf biheyecan a. O wext ti kes Kobanê de nêmendbî û ma nêşînayêne hende bi hawayo rehet bimeşî. Ma saya bi seyan şorişgerê ke canê xo feda kerdî de ewro bi rehetî eşkenî tîya de bigêrî. O wext tebîet zî sey roja ewroyên keske nêbî, ewro tebîet de ganîtîyêk esto.”

KAWAYO ASINKARÎ

Firatî peynîya qiseykerdişê xo de va ‘şero ke seba Şorişê Rojawanî ame meşnayîş, ganî seba şorişê Tirkîya zî bêro meşnayîş’ û qiseykerdişê xo wina qedêna: “Ruhê fedayî yo ke Kobanê de ame xelqkerdiş, ganî seba Tirkîya zî bibo. Adiro ke hetê Kawayo Asinkarî ra amebî tafînabî, ewro Kurdistan de destê bi hezaran kesan de sey meşaleyêk veşeno. Ma do şehîdê ma yê ke vera çeteyan de erjê merdimîye pawitî, qet xo vîra nêkerî. Ez veng dana her kesî wa seba girdkerdişê têkoşînî beşdarê têkoşînî bibî.”

Do Cenevre de zelal biba

Kombîyayîşê Astana ke seba çareserîya krîzê Sûrîye 23ê çileyî de bi rayberîya Rûsya, Îran û Tirkîya de amebî viraştiş, netîceyo ke hetê nê dewletan ra ame waştiş, nêame girewtiş. Derheqê kombîyayîşî de munaqeşeyî hîna zî dewam kenî. Yeno vatiş ke bitaybetî vato ‘yê muhîm pêvînayîşê Cenevre yî, Astana ra çîyêk nêvejîyeno’.

Babete ser o Unîversîteyê Kadîr Hasî de Pisporê Têkilîyê Mîyanneteweyî Solî Ozelî qisey kerd.

Ozelî qiseykerdişê xo de va ‘Eke merdim hetê Amerîka ra mesele ra biewnîyo, o wext vîneno ke operasyonê Reqqa beno muhîm’ û wina domna: “Kurdê ke bi astengkerdişê Tirkîya beşdarê pêvînayîşan nêameyî kerdiş, nika operasyonê Reqqa ver rewşa înan bena krîtîk.”

REQQA BIBEDILNA

Ozelî dewamê qiseykerdişê xo de va ‘Tirkîya sere ra nata îtîrazê beşdarbîyayîşê PYDyî kena’ û qiseykerdişê xo rê wina dewam kerd: “Qaso ke ma vînenî, ti kes seba ke kurdî beşdar bibî, zorî nêdanî. Tirkîya heta nika waştişê xo bi her kesî da qebulkerdiş, la nika îxtîmal esto ke Reqqa na rewşe bibedilna. Çimkî Amerîka operasyonê Reqqa de YPG û PYD ra bawer kena.”



ESAD PÊ NÊKENO

Ozelî qiseykerdişê xo de qala Astana kerd û wina va: “Metnê pêkerdişî esto, labelê heme muxalîfî îmze nêkerdî. Nêyî vanî ma seba ke adirbest îlan bikero, pêşnîyaz berdo Esad rê. Labelê ez bawer nêkena ke Esad waştişê înan qebul bikero. Her kes Rûsya ra vano, ti eşkena hal bikera, labelê ma do bivînî. Heto bin ra çareserkerdişê krîzî de rolê Cenevre zî esto. Ewja de Amerîka zî do bibo. Vatişê Amerîka muhîm o û do o wext dîyar bibo.”

ANQARA - DÎHABER

Cêrzemînêk de tena cuyenî

Wexto ke Stenbol yeno vatiş, dramê kesê ke taxa Tarlabaşi de cuyenî, yeno vîra merdimî. Kesê ke na taxe de cuyenî, înan ra yewe zî cinîya gazîyê şerê Kibrisî Suleyman Guzedeyî, Gurece Guzedeye ya. Gurece û yew domanê xo cêrzemînê de cuyenî û pê arêdayîşê qaxitan debara xo kenî.

Gurece Guzedeye qala zehmetîyê ke ancena, kerde.

HENEKÊ XO KENÎ

Gurece Guzedeye destpêka qiseykerdişê xo de bale ante zehmetîyê ke anceni ser û wina va: “Lajê mi pê arêdayîşê çopan debara ma keno. Mêrdeyê mi gazî yo, la keyeyê ma de nano ke ma biwerî çin o. Ma 400 TL kîraya cêrzemîno yew odeyin danî. Serekê Şaredarîya Beyoglu ame tîya û soza hetkarîye da, la soza xo zî nêard ca. Mêrdeyê mi seba na dewlete şer kerd. Lajê mi nasnameyê xo vînî kerd û nasnameyo newe ci rê nîno dayîş. Her tim ma xapênenî.”

Gurece Guzedeye qiseykerdişê xo wina qedênaye: “Tirkîya hetkarî nêdana hemwelatîyanê xo, do senî bida şarê ke Sûrîye ra koç kerdê. Lajê mi wexto ke qaxit arê dano, xebatkarê şaredarî lajê mi kuwenî û dest ronenî erebeya ci ser de. Wa nasnameyê lajê mi bêro dayîş, sewbîna ez çîyêk nêwazena.” *STENBOL - DÎHABER*

Nesilê pisînga Wanî ver bi çinbîyayîşî şono

NÎMET OLMEZ / WAN - DÎHABER

Pisîngê Wanî bi muyê xo yê sipe, bi çimanê xo yê rengin û asnawkarîya xo ya mîyanê awe de bi yenî zanayîş. Yeno zanayîş ke mucewherê Hîtîtan de mora pisînga Wanî esta. Wexto ke Roma herême de hakim bîye, o wextî beyraqa şer û qalxanan de fotografê pisînga Wanî neqiş kerdêne û sey ‘pişîk’ bi name kerdêne. Pisîngê Wanî bi kaykerdişê awe ra zaf hes kenî, pak î û zaf jîhatî yî. Cok ra nînê perwerdekerdiş.

Babere ser o Mudirê Merkezê Cigêrayîşê Pisînga Wanî Prof. Dr. Abdullah Kayayî qisey kerd.

Prof. Dr. Kayayî qiseykerdişê xo de dîyar kerd ke pisîngê Wanî tarîx ra nata dormeyê gola Wanî û koyanê Wanî de sey heywanê kedîkerde cuyayî û wina va:

“Dima ra wanijî pisîngan keyeyan de miqate kerdî. Hîsê nê pisîngan zaf zêde yî û girêdayeyê keye yî. Nê pisîngî mabenê xo û merdimê keyeyî de heskerdişêko zaf pîl awan kenî. Seba ke zaf bi hîsin î, lez heridîyenî”

VER BI ÇINBÎYAYÎŞ DE YÎ

Kayayî bale ant neslê pisîngan û qiseykerdişê xo wina qedêna: “Neslê pisîngê ke yew çimê înan rengê turkuaz o û çimo bîn zî rengê kehrîbar o, ver bi çinbîyayîşî de yî. Seba ke pisînga Wanî sera 16 leyîran ana, no zî beno sebeb ke neslê ci çin bibo. Sebebo bîn zî rotişê psîngan o. Pisîngê Wanî teberê bajar û welatî rê yenê rotiş. Wextê girnîyawî de zî seba tewirê înan ra pisîngî çin î, o zî beno sebeb ke no tewir çin bibo. Ma seba pisîngê ke ver bi çinbîyayîşî şonî, xebetîyenî.”

www.arsivakurdi.org

Rojeva Medya

26 Çile Pêncşem 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
Yönetim Yeri: Kooperatifler
Mahallesi Akkoyunlu
4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
Yenişehir-DİYARBAKIR

Tel: 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
İstanbul: Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler
Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. *No:* 23/A
Küçükçekmece İSTANBUL
Tel: 0 (212) 580 63 81
Adana: Arslan Güneydogu
Gazetecilik,
Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
*No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
e mail:
rojevamedya@hotmail.com

Warê efsaneyan Kobanê

Li her kolaneke Kobanê çîrokek berxwedanê heye. Hemû şêniyên Kobanê xwedî çîrokên berxedanê ne. Kobanêya biçûk bi berxwedana efsanewî navê xwe mezin kir û di cîhanê de da naskirin. Di heman demê de Kobanê bû warê yekitiya gelê kurd û Kurdistanê

ABDURRAHMAN GOK / KOBANÊ - DÎHABER

2 sal piştî şerê li Kobanê dîsa li Kobanê me. Dema ez di kolanên Kobanê re dimeşîm rastî berxwedêrên Kobanê hatim. Bi tesadufî rastî berxwedêrekî ku berê min ew dinasîn, hatim. Berxwedana Kobanê, roja fermandar Gelhat şehîd ketibû, ew jî wê rojê birîndar bû. Dema Berxwedan Kobanê ji bo dermankirina birînên xwe diçû nexweşxaneyê em rastî hev hatin. Ji serê xwe, milê xwe û pêyên xwe şopên birînan hebûn. Piştî şerê li Kobanê li Girê Spî, Tişrîn, Minbicê dîsa di şer de cih girt û li vir 5 caran birîndar bû. 3 caran bi giranî bi giştî 6 caran birîndar bû. Piştî birîndar bû ji bo dermankirinê hefteyekê destûr girtiye û hatiye Kobanê.

Dema ku em rastî hev hatin, fêm kir ku min ew nas nekiriye. Ji bo ku ew bê bîra min roja berxwedana Kobanê wiha vegot: "Tê bîra te maşîneyek me ya doçka hebû. Derb lê ketibû. Ji ber ku cama wê ya pişt girtî bû, me bi naylonê girtibû. Her dem em bi wê cama şikestî re mijûl dibûn. Dema te em di wî halî de dîtibûn, te wêneyê me kişandibû û bi me re sohbet kiribû. Piştre çend carên din tu hatibû eniya me ya şer." Dema Berxwedan qala wan rojên xwe kir, hêdî hêdî ew hat bîra min. Piştre em rûniştin û wî dirêj dirêj qala bîranînên xwe kir û got ku di heman rojê de piştî 45 deqîqeyan hevalê Gelhat şehîd ket.

'TREKS BÛ DOJEH'

Berxwedan Kobanê rojên xwe yên şer ku ketibû ber kamerayan wiha tîne bira min: "Ji bo ku em ji kolanekê derbasî kolana din bibin. Em li treksê (kepçeya bi pola hatiye pêçan) siwar bûn. Ji nişka ve treksê derb xwar. Bawer im me derb xwar. Li tenişta min heval Cemal hebû, şehîd ket. Siyabend bi giranî birîndar bû. Min jî ji pêyê xwe, milê xwe û serê xwe parçeyên guleyê xwarin. Her çend dengê cîhanê nedihat min jî min têkilî bi bêtêlê danî û min bi bêtêlê got heval Cemal şehîd bûye. Nava treksê wekî dojehê bû. Heval Siyabend pir xwîn winda dikir. Piştî hevalan anonsên me bihîstin êrîşên li dijî çeteyan zêdetir kirin. Heval Gelhat, ji hevalên din re got 'Hevalên di hundirê treksê de dijîn. Divê teqez em wan rizgar bikin.' Hundirê treksê bûbû dojeh.

XWÎN WINDA KIR

Piştî hevalan ez girtim gotin wan xwe gihandiye Siyabend û ew rakirine nexweşxaneyê. Lê hêj Siyabend negihaştibû nexweşxaneyê şehîd bûbû. Yê min jî birînên mil û serê min sivik bûn, lê ya pêyê min giran bû. Pir xwîn ji min çû. Yek ji wan parçeyan hêj di serê min de ye. Ez piştî 40-45 deqîqeyan hatim ser hişê xwe. Min dît ku çend heval li ser serê sedyeyeke din kom bûne. Min dît ku milek ber bi jêr ve dirêj bûye. Min ji cil û milê wî fêm kir ku ew hevalê li ser sedyeyê Gelhat e. Piştî me birîndar bûbû û li wir şehît ketibû. Min xwest rabim. Lê li tenişta min Şehîd Welat hebû. Moralê Şehîd Welat gelekî xerab bû. Lê dîsa ez çûm tenişta wî û min lê temaşe kir. Min dît ku heval Gelhat e. Rojên dijwar bûn. Şehadata heval Gelhat ji bo min gelekî dijwar bû. Ji ber ku min berê jî ew nas dikir."

BERXWEDÊRÊ KOBANÊ

Berxwedan Kobanê wêneyekî ji berxwedana Kobanê nîşanî min dide. Di wêneyê ku 24 kes tê de hene 20 kes jê şehîd ketine. Yek bi yek navê wan û taybetmendiyên wan ji min re dibêje. Berxwedan Kobanê wêneyê Şahan Çavşîn nîşanî min dide û diyar dike ku di rojên borî de di duyemîn pêngava



Raqqayê de şehîd ketiye û wiha dibêje: "Ji koma me Mordem, Delîl, Serhat, Demhat, Cûdî, Gever, Demhat, Egîd, Amed, Firat, Zemanî û hevalên dîn şehîd bûn. Avareş Marînos jî piştî me hat. Piştî hat 10 roj şûnde şehîd bû. Ez jî li Kobanê, Girê Spî û Tişrîn Seddî 3 caran bi giranî birîndar bûm û 3 caran jî sivik birîndar bûm."

NEFEL JÎR Û JÊHATÎ BÛ

Berxwedan Kobanê piştre Fermandar Cûdî Amed û sabotajvan Nûman Nêrgiz tîne bîra xwe. Diyar dike ku di rizgarkirina gundên Kobanê de gelek hevalên wan di paqijkirina mayînan de şehîd bûne û wiha behsa wan rojan dike: "Me li gundê Bexdikê gelek hevalên xwe winda kirin. Mizgîn Alan (Nefel) jî li wir şehîd bû." Min behsa roportaja bi Apê Nemir re ani bîra wî. Min fêm kir ku ew dîmen temaşe nekiriye. Min ew wêne nîşanî wî da. Piştre dest bi vegotinê kir: "Heval ji Sêrtê bû. Min berê ew nas dikir. Xwişka wê jî şehîd e. Hevaleke hêja bû. Jîr û zana bû. Fermandara taxima Bexdikê bû. Tevî hevalên xwe şehîd bû. Nefel, Cûdî Efrîn, Bêrîtan, Hasret, Asmîn, Şîn Semsûr, Mazlûm, Rizgar, Siyabend, Cûdî Mardîn, Baran hemû di heman rojê de şehîd bûn." Şervana ku wê demê min navê wê nepirsîbû min fêm kir ku Şîn Semsûr e û li Bexdikê şehîd bûbû. Dema min ew tarîf kir Berxwedan ev tişt got: "Ew bi xwe ye. Ew jî li Kobanê di eniya me de bû. Li zanîngeha Mêrsînê xwendekar bû. Ferhat, Çeleng, Canfeda, Cûdî Amed, Egîd Mûş, Herekol, Reşat, Didar, Erdal, Simko, Rûken hemû şervanên pekrewan bûn. Şehîd Rustem çalakiya fedaî pêk anî."

CÛMA GOYÎ

Berxwedan Kobanê, behsa maşîna bombeyî ku di deriyê sînor de çawa ji aliyê Cuma Goyî ve hat îmhakirin vedibêje û wiha berdewam dike: "Hin şervanên efsanewî nayên zanîn. Tê bira we ji milê sanayiyê ve maşîneyeke bombebarkirî hat nava hevalan. Wê demê me bi bisfing û BKC'yan lê da, lê ji ber ku maşîne zirxî bû, feyde nekir. Wê demê Cûma Goyî bi maşîneya doçkayê çû pêşiya wê. Li maşînê qeliband û maşîine teqiya. Cûma wê demê li wir şehîd bû. Heke ne wisa bûya dê bi dehan hevalên dê şehîd bibûna. Ez hevalên xwe tînim bîra xwe û xeyalên wan pêk tînim. Dibe ku ji ber ku hêj min deynê xwe nedaye, ez hêj dijîm."

'EM BI SER KETIN'

Em derketin li Kobana ku hêj şopên şer lê ne, geriyan. Piştre zarokekî 14 salî derket pêşiya min, ji min re dibêje ez te nas dikim û dest bi gotinê dike: "Tu bi hevalê xwe re (Ersîn Çaksû) hatibû girkê Tilşeîr. Te nûçe çêdikirin. Me Kobanê neterikand. Em 6 bira ne û yê herî mezin 15 salî ye. Dema gel reviya bavê min jî got em jî biçin. Lê dayika min got em ji Kobanê dernakevin, bavê min bi tena sere xwe çû. Piştî 3 rojan bavê min bi hevalên xwe re zivirî û tev li şer bû. Ji ber ku em biçûk bûn tev lê nebûn, kurê mamê min û kurê xaleta min şehîd ketin; Mustafa û Hesen. Ev kesên ku hûn wêneyên wan li kolanan dibînin, hemûyan canê xwe daye."

Yek ji birîndarên din ên Kobanê Omer Kobanê ye. Di 5'ê cotmehê de li Miştenûrê birîndar bûye. Wiha dibêje: "Ez nizanim çawa birîndar bûm. Em li ser ban di eniyê de bûn. Di cih de tiştek li dîwar ket û ez ji dest û lingê xwe birîndar bûm. Heval dibêjin tu bi guleya tangê birîndar bûyî. Rojên zehmet bûn, rojen herî zehmet 4'ê cotmehê heta 20'ê cotmehê. Di wan rojên zehmet de gelek hevalên me şehîd bûn. Heke tu bipirsî tişta herî zehmet çi bû; paşde vegerîna me bû. Ji ber ku di vegerê de heval şehîd diketin û birîndar dibûn. Şehîdbûn nebû nesîbê min. Di rastiyê de birîndarî di hesabê de tune bû. Em ê şehîd biketana, lê nebû. Dema Kobanê azad bû min li Bakur tedawî dît. Em girtin û anîn pîrozbahiyên Edmanîkê. Ez nikarim hestên xwe yên wê demê îfade bikim."

'Em bi saya kesên şehîd ketine li warên xwe vegeriyan'



DAYIKA bi navê Hedlê Elo ku dibêje ji gundê Mişko ye, di mala ku bi zorê xwe li ser piyan digire de ji halê xwe re şikur dike û wiha dibêje: "Mal û milkê me talan kirin. Em 3 mehan li Pirsûsê man. Piştî bajar hat rizgarkirin em vegeriyan ser axa xwe. Divê em mutewazî bin. Ger em vegeriyabin, ev bi saya keç û kurên me yên li goristanê ye. Divê ev tu caran neyê jibîrkirin. Divê em layîqî wan şehîdan bin." Dayika Eyşe Evdila jî yek ji dayikên bedeldayî ye. Dayika Eyşe da zanîn ku beriya çend rojan di hemleya Reqqayê de keça xwe Agirî Kobanê şehîd daye, keça wê Rohilat jî di hemleya Sirrînê de cih digire û kurê wê Memo jî ji milê xwe birîndar bûye. Li vî bajarî êşa her kesî heye. Lê kesên herî biêş ew in ku yên di eniyên şer de hevalên wan birîndar û şehîd bûne.

Gelek bav hebûn ku Kobanê terk nekirin

LI GEL ŞERVANAN sîvîlên ku bajar diparast jî hebûn. Yek ji van Mehmûd Mihemmed Elî yê 50 salî ye. Dibêje beriya şer li dibistana kurdî mamoste bû. Ji sala 91'an heya 2007'an ji ber fikrên xwe yên siyasî li Şam û Dêrezorê di girtîgehê de maye. Bavê 4 zarokan Mehmûd, yek ji wan kesan e ku bajar neterikandiye. Mahmûd diyar kir ku malbata wî derbasî Bakur bû, ew bi xwe ji bo pêwîstiyên şervanan bîne cih li bajar maye û wiha got: "Di 13'ê cotmehê de li rojhilatê deriyê sînor bi guleya sekvanekê ez ji milê xwe yê çepê birîndar bûm. Piştî min 13 rojan tedawî dît, dîsa vegeriyam. Bi hevala Destîna re malek ku komek hevalên jin lê diman hebû. Hevalan xwest ji bo pêwîstiya avê bê çareserkirin qazanê vekin. Dema em bi 4 hevalan re ber bi noqteyê ve diçûn rastî êrîşê hatin. Hevala Destîna ji me re got 'êrîşî wan bikin'. Lê bi tirsa ku dê cihê me diyar bibe me êrîş nekir. Piştre hevalan êrîşî çeteyan kir û em jî wiha gihaştin cihê xwe. Hevala Destîna xwest derkevin ser ban û hewaya di boriyan de vala bikim. Ger rastiyê bixwazin em wekî hevalan wêrek nebûn. Min got ez nikarim derkevim ser banî. Dema got 'tu ditirsî' ez derketim. Me av girê da. Piştre heval Destîna bi hevalên xwe re şehîd ket. Me cenazeyên wan girtin û defin kirin." Mehmûd anî ziman ku gelek kesên mîna Bavê Botan, Mûrat, Beko, Mihemmed Şêxo, Fehmî, Bavê Welat, Şehîd Osman, Kupê, lastîkçî Mihemmed ên ku temenê wan mezin û bajar neterikandin, hene.

'Kobanê biçûk bû lê mezin bû'

ARJÎN yek ji wan e ku di berxwedanê de şopên şer li ser heye. Dema êrîşan dest pê kir li Kantona Cizîrê şer dikir. Di rojên destpêkê yên mijdarê de, di hewldana 7'emîn de xwe gihand Kobanê. Piştî mehekê bi bombeya avêtin eniya wê birîndar dibe. Niha çavekî wê kêm dibîne. Di rûyê wê de şopên şarapnelan hene û tiliyên her du destên wê tune ne. Li gel vê jî deqeyekê nasekine û dibêje: "Me hemû tişt dabû ber çavan, tenê armanceke me hebû, azadbûna Kobanê bû. Piştî min mehekê şer kir birîndar bûm. Xeyaleke hemû hevalên me hebû ew jî azadiya Kobanê bû. Dibe ku gelekan ew roj nedîtibe, lê hevalên wan xeyala wan pêk anî. Kobanê biçûk bû lê mezin bû."

www.arsivakurdi.org